



Armanc

Danerê rojnameya pêşî ya Kurdi
Miqdad Mihemed Bedirxan

HEJMAR/NO: 173, NOVEMBER/ÇIRIYA PAŞIN 1996, BUHA/PRICE: 20 SKR, 4 DM

Divê em êdî bêjin bes e!



■ ■ Gelî serok û siyasiyên Kurdan! Bes e, bes e idî ev leyistika tîrajîkomîk! Bes e idî hûn bûne qesabê îradeya miletê Kurd, bi kêra dijminî vê îradeyê her cara ku zîl bide; hêşîn bibe serjê dîkin!

■ ■ Kurdino! Gelî ronakbîr û hisyarên Kurdan! Ma ku ew bûne qesabê îradeya me û bêwestan ser dibirrin, em ci ne gelo? Ma em wekî wê berxa bêmecal a ku hustuyê xwe li ber kêra qesabî dirêj dike, ne ew qas bêçare, bêxîret, bêhêvî û bêşûûr in ku îradeya xwe li ber postal û qundaxêñ çekêñ van siyasiyan radixin da binpê bikin, qetil bikin. Kurdino, sûcdarê esasî em in. Em bi xwe pê qeyil in, rê didin, bêdeng dimînin an piştgiriyê didin ku ev siyasetê han di nava me de rewacê bibînin. Heke siyasiyên Kurdan bidîtana ku miletê Kurd tu carî siyasetê wiha qebûl nake, li pey siyasetê wiha naçe û bi şiddet red dike, wan cesaret nedikirin û imkan nedidîtin ku vê siyasetê li nav civaka me bimeşînin. Me bazar vekiriye, em qîmet û perê xwe didin, siyasetê wiha ji bo xwe dikirin ku loma jî ew tînin li nav me difroşin! Divê em bizanibin ku çaresî ji me destpê dike, heta em muşterî bin wê firoşen vê siyasetê hebin û wê ev di nava me de rewacê bibîne. Divê em idî bêjin bes e! Bi gerardarî rê li ber vê siyasetâ qirêj a malwêranker bigrin.

■ ■ Gelî ronakbîran bo ci hûn bê deng dimînin, rabin ser xwe û berê xwe bidin millet, heqîqetê di çavê millî rakin da bibîne û hisyar bibe!

Rûpel: 3

RÜPELEK JI DİROKA ME YA HEVDEM: PDKT

Nivîskarê me Zinar Soran di vê hejmarê de dest bi lêkolîna xwe ya li ser damezirandina Partiya Demokrat a Kurdistana Tirkîyê dike. Avakirina PDKT di dîroka me ya hevdem de qonaxeke gîring e û destpêka damezirandina partiyêni siyasi yên illegal ên Kurdistana Bakur e.

Rûpel: 8-9

KEWNAME

"Tu bi serok û serlesker û virokan, tu bi kînê û şînê, bi reşgirêdanê, bi bendêne nemanê, bi asoyêngiryanê, bi ferhenga talanê, bi goristanan, bi diz û bazirganan, bi binemal û bi galgal û bi fort û sloganêngal, hatiyî dorpêçkirin."

Nivîsa Ehmed Huseynî

Rûpel: 14

JI 'DÎN'Ê WEHA RE CAN QURBAN!

Faris Can di Neynikê de dinivise ku:"Xwezi hemû berdevkêñ dewleta Tirkîyê jî wek Kaddafi ji mêt ve 'dîn' bûna û wek wî bigotana ku Kurd birayêñ me ne, ci mafêñ me hene bila yêñ wan jî hebin û di bin tava Rojhilata Navîn de ew jî wek me bi azadî û serbestî bijîn."

Rûpel: 5

Mirineke medyatîk

M. SAID ALPASLAN

Di van rojêni dawiyê de herroj rojeva Tirkîyeyê tê guhertin. Rojeke dinêri "icraatê" hukûmeta Refahyolê dibin manşet û sernîvisen rojnameyan, rojeke din têkiliyên mafîya û dewletê dertêne pêş, rojeke din bûyer û şerê Kurdan dikevin rojevê. Li Tirkîyê herseet rojev tê guhertin.

Di encama şerê di navbera Kurd û dewletê de ji herdû aliyan ji "goristanê şehîdan" zêde dibin, ciwanen wan kêm dibin. Ëdi keçen ciwan bi xwekuştinan canê xwe fêda dikin û bala raya giştî dikşinîn ser pîrsa Kurdi. Lî gelê Diyarbekirê ëdi westiyaye, li hember buyaran kerr û lal bûye, bê deng dumînin.

Zekîye Alkan keçikeka dil pola bû. Bi çîrûskê Newrozê taritiyê çîrand. Lî wê demê pressa dewletê propagnda kir û gotibûn ku; "Zekîye bi hevalên xwe re çûbû seyranê, ew li wir pankrat dalqandîne tînera ku di destê Zekîyê de maye, bêhemdî bi agirê cixarê têqiyâ û ew şewitiye, hevalên wê ji dev jê berdane û reviyane. Ji xwe Zekîye bi problem bû, problema wê ya psîkolojik hebû".

Zeyneb Kinaci bombayê li canê xwe pêçand û li warê Seyid Rîzo li deriyê Sîmê canê xwe kir qurbana Kurdistanê. Dîsa rojnameyanen pressa dewletê nîvîsandin; "ji xwe Zeyneb ketibû krîzê. 3-4 meh beriya xwekuştînê mîrê wê ji hatibû girtin û ew du can bû. Ji ber ku

'terorîstan' vê zeftîya wê dîtin wê şandin mirinê".

Ya ku ez fahûnakî mirov çawa dikare bi darê zorê here mirinê û xwe bikuje. Ji ber ku bûyarêne weha êdi ne awerte ne û çiqas dihere hejmara wan zêde dibin.

Îcar li Edenê, Leylaya Omerî di riya Leyla Qasim, Zekîye û Zeyneb de çû. Leyla Kaplan bombeya ku li laşê xwe pêşabû li ber qereqola polis tecand xwe feda kir. Ev bombe nijadperestan şas kir û derewên wan derxist holê. Lî ew dîsa wek berê "terorîstan" gunehkar kirin. Îcar Wezîre Karûbarê Hundîrîn Mehmed Agar di dewrê de bû. Wî got: "xwediravî Leyla nameyeke ji rîexistina xwe te şandiye, daxwaza vejetandina xwe kiriye, li ser vê yekê rîexistin bi darê zorê wê îkna kiriye û vê bûyarê bi wê daye kirin. Ü berê ew dest bi vê bûyarê bike bi eroînê wê serxweş kirene."

Hîn derewên wan xelas nebîbûn îcar li Sêwasê li bajarê Pîr Sultan Abdal bombeyeke din teqîya. Dîsa keçikeka Kurd bi navê Guler Otac him xwe feda kir û him ji 3 polisan kuş. Dewlet şas inabû. Ëdi nikaribû derawan ji bike. Îcar gotin; "baş bû ku bombe di seyarê de teqîya ku meydana merasima cejna Cumhuriyê de biteqîya bi sedan leşker dê bihatana kuştin". Yanî dewlet ji bo ku derewan bike û bi medyaya xwe propagandaya negatîv bike her rî ji xwe re mubah dîbîne.

Ez nabêjim ev tevgerên xwekuştînê baş in an ji xerab in. Dê dem û dewran qencî û xerabiya wan eşkere bikin. Min xwest derevên pressa Tirkîyeyê derxim ber çavan ku ev çawa dikarin bi derewan tesîrê raya giştî bikin. Ku em ji li hember wan bêdeng bîmînin, dê ev mirina me be.

Sersaxî

Ji bona Komîteya Navendî ya
El-Partî û malbata Kemalê Ehmed Axa



Em ji ber wefata Sekreterê Partiya we, Partiya Demokratê Kurden Sûriyê- (El-Partî) gelek xemgîn in. Em ji hemû kadir û endam û hevalbendên we re û ji malbata mîrza Kemalê Ehmed re sersexî dixwazin.

Hevalên hêja;

Wefata Sekreterê Partiya we ji bo gelê Kurd li Sûriyeyê û ji bona têkoşîn û berxwedana parastina gelê. Kurd wendabûnek mezîn e. Em baş dizanîn ku pêwîstîya gelê me bi kesen weha rewşenbîr û sîyasetzanan gelek heye. Kesen weha giranbûha ji bona gel xwedîyên rolêne mezin in. Lî em bawer in dê gelê Kurd valayîya wan dagire û doza wan bidomîne. Kiryar û ramanen wan di têkoşîna gelê me de her bijî.

Em dîsa tevî silavên xwe, tevî xemgînî û birêzbûyina xwe sersaxiyê ji bo we û ji bo gelê xwe dixwazin û hêşa we parve dikin.

Partiya Yekîtiya Sosyalist a Kurdistanê (PYSK)
Komîteya Navendî

Di 3'ê Çiriya Paşîn de Sekreterê Hizbê Demokratî Kurd fi Sûriyê (El-Partî) Kemalê Ehmed Axa û endamê mekteba siyasi yê Partiya Çep a Kurd li Sûriyê Şêxmûs Yusif Şêxmûs (Bavê Serdar) di qezayekî, di navbera Hesekê û Qamişloyê de çûn ser heqîya xwe. Em ji malbata wan û partiya wan re sersaxiyê dixwazin. Bila serê gelê Kurd sax be.

Armanc

Armanc

Rojnameya Kurdi
ya mehanê
&
Monthly Kurdish Magazine

Hejmar 173

Redaktorê berpirsiyar

Mûrad Ciwan

Redaksiyon

Mumtaz Aydin
Faris Can
Nihat Eli
Ehmed Huseynî
Yakub Karademir
Remzi Kerim
Mahmud Lewendi
Hesen Mizgin
Emîn Narozi

Nûçegîhan

M. Sait Alpaslan-D.Bekir

M. Ali Karaaslan – Almanya
Tel/Fax: 49-6403-74529

Teyib Alan Kolçi-Fransa
Tel. Fax: 33-1-44630735

Azad İbrahim – Ingilîstan

Sertên abonetiyê Abonetiya salekê

Skandînaviya: 250 SEK
Ewrûpa: 60 DM
Derveyi Ewrûpayê: 50 \$

Prenumeration maqam/myndighet 450 SEK

Anons / İlân
Nîv-rûpel
5 000 000 TL
2 500 SEK, 500 DM

Adresa Ewrûpayê Box: 15216 16115 Bromma Sweden

Tel: +46-8-803135
Faks: +46-8-801825

Hesabê Ewrûpayê Postgiro: 4972255-6 Sweden

Ji bo aboneyén
Almanyayê
M. Ali Karaaslan
Dresdner Bank – Giessen
Konto: 8 838 847 00
BLZ: 513 800 40

Utgès av
Kurdiska demokratiska
arbetarunionen

ISSN: 0348-7385

Çap: APEC

FİSA ABONETİYÊ

Armanc

SWED: Armanc, Box 15216, 16115 Bromma – SWEDEN
Postgiro: 4972255-6, SWEDEN • 250 SEK/sal

ALMANYA: M. Ali Karaaslan, Dresdner Bank – Giessen
Konto: 8 838 847 00 • BLZ: 513 800 40 • 60 DM/sal

TIRKIYE: Yakup Karademir, Akbank T.A.S., 142 Aksaray – İSTANBUL
Hesab no: 0017880-6/BU6/01 • 400 000 TL/sal

Aboneyen Ewrûpayê abonetiya xwe li ser hesabén Ewrûpayê bisînin û yên li welati ji li ser hesabé welati bisînin

NAV

ADRES:

PEREYÊ DAYI

Gava berî çar salan Kurdên Kurdistana Iraqê bi gelempirî li gund û bajaran serî hildan, iradeya xwe ji bo hemû dinyayê diyarkirin ku ew bi idareyeka dagîrker a zordar qayil nabin; ew ji wekî hemû insanen ser ruyê erde dixwazin li ser axa xwe, bi serbestî û azadî bijin, tûşî şeran, penaberî û qetliaman nebin, bibin xwedanê kar û bartan, bi aşlîn xwe têr, asûde, aram û ji pêşerojê bibawer bijin.

Piştre, gava hilbijartin li ser vê axa rizgarkiri ya vî perçeyê welêt çebû, Kurdan ew iradeya xwe ya mili dan destê partiyen xwe yên siyasi, ku parlamento û hukumeteka wan a ji vê parlamentoye avakirî were ser karûbarê vî perçeyê welêt. Bi diyarbûna irada milletê Kurd ji herdu aliyan; di riya serihildan û ya hilbijartinan re, eşkere bû ku Kurd dixwazin bibin milletekî gihaştî yê xwedan mueseseyen millî yên modern, wekî her milettekî din. Maneya vê, cw bû ku Kurdan mohra iradeya xwe li binê peymâneka muşterek dabûn ku idî dev ji jiyan, rîveçûn û xwediyarkirinên eşirtî, barbařî û hovîti berdin, bibin civakeka modern ku di riya muesesêni modern û netewî re bi hev re bidin û bistînin, idî efendîti û xulamî rabe, xwedîti û teb'atî nemîne, her ferdekî welêt, wekî hemî ferdîn din û qasî hemî ferdîn din xwediyê vî welatî be, tê de ne wekî teb'ayê emirber, lê wekî hemwelatiyê azad bijî, hemû problemen xwe yên bi hemwelatiyê din re di riya mueseseyen millî û demokratik re çareser bike.

Ü di tarîxa milletê Kurd de ji demen mîrayetiyyen xwedan serbestiya navxwe û vir de, ev cara pêşîr bû ku qet nebe li ser beşekî axa welêt, Kurdan demeka ew qas dirêj û firsendeka ew qas lêhatî bidestxistin ku karibin vê iradeya diyar-kirî bicîhbîkin, bikin xwedan esas û bin-geh, welê lê bikin ku kes rema karibe wê ji meydane rake. Em bînîn bîra xwe, ne di dema Şêx Mehîmûdê Berzencî de, ne di dewra avakirina Cumhûriyeta Mehabadî de, ne jî di dewra peymana 11-ê Adara 1970-yan de Kurdan dewreka ew qas dirêj a jiyaneka serbixwe bidest nexistin. Şertîn dînyayê ew qas ji bo Kurdan negîhaştin. Li hemû perçen Kurdistana Kurdan ew qas dilê xwe bi hev re nekitin yek; şerê xwe li hemû perçeyan ewqas bi berfirehî li dar nexistin.

Firsenda ku Kurdan di van çar salen dawiyê de bidest xist di tarîxa miletê Kurd de bi her awayî mezintirin firsend bû, lê nebû, hêsta du salen vê firsenda

MURAD CIWAN
m.cigin@pocab.se

Qesab û Berx

dîrokî xelas nebûn ku bîzzat serokên Kurdan; partiyen siyasi yên ku ew serpereştiya wan dîkin, wekî quesaban, ev iradeya bi serihildan û hilbijartinan dîyarkirî dan ber kîran serjekirin; ne parlamento ma, ne hukumet ma, ne dadgeh û muesesêni millî yên din, ne jî peymâna hemwelatiyê man; cardin riyên çareserkirinan bûn awe û uslûbîn eşirtî, barbarî û hovîti. Ji dijmin bêtir û ji dijmin hov û hartir êris birin ser hev, qetliam û talan kirin. Mal û zeviyen xwe bi destê xwe sotin. Ji bo ku li hemberî hev serdest bibin cûn serê xwe li ber Iranê; Iraqê, Tirkîyê û Sûriyê çimandin ku her çar jî dijminê milete wan bûn, ew kirin şirîkîn û heta efendiyen idarekirinê welêt; ango tarûmarkirina welêt, di neticê de ji hev hinde dûr ketin ku her yek li aliyeke cûn ketin hembêza dijminekî û emr û fermanen wan li ser irada xwe qebûl kirin.

ku li Kurdistanê kî yê bibe mîrêmîran ê Kurdistanê, li hev nekitin, baweriya xwe bi hev neanîn; li ser mîrekî Kurd li hev nehatin. Di encamê de ji İdrîsê Bedlîsi re xeber verêkirin gotin ku em li ser mîrêmîriyê baweriya bihev naynin, ya çêtir ew e ku tu ricayê ji sultanê Osmanî bike bira paşayekî bişne da li Kurdistanê bibe mîrêmîran. Sultan ev rica bi kîfxweşiyeka mezin qebûl kir. Pişt re gava mîrayetiyyen Kurdan hatin hilweshandin, vî mîrêmîranê paşayê Osmanî her carê fermandariya ordiyên sultanan dikir. De vê carê bala xwe bidin vê tragediya iroyin ku her du partiyen Kurdistana Iraqê hatin li Ankarê hustuyê xwe li ber Tîrkan şûşî erde kirin, Çiller xanîmî du Turkmanen Iraqî anîn li ser serê wan ferz kirin. Ew baweriya bi hev naynin, wê Turkman bibin çavdîr û hake-mîn wan, xwedêgiravî nehîlin şer bikin û li ser esasê wekheviyê dê bi wan te têkevin idareya muşterek ji. Yanî Tirkîye bû şirîkî idarekirina Kurdên Kurdistana Iraqê ji, heke em nebêjin bû takehakimê wê. Ma ev ne tekerura tarîxê ya bi awa-yekî komedî ye lê ci ye gelo?

Geli serok û siyasiyên Kurdan! Bes, bes e idî ev leyistika tîrajîkomîk! Bes e idî hûn bûne quesabî iradeya milete Kurd, bi kîra dijminî vê iradeyê her cara zu zîl bide; hêşîn bibe serjê dîkin!

Kurdino! Gelî ronakbir û hişyarên Kurdan! Ma ku ew bûne quesabîn irade-

ya me û bêwestan ser dibirrin, em ci ne gelo? Ma em wekî wê berxa bêmechal a ku hustuyê xwe li ber kîra quesabî dirêj dike, ne ew qas bêçare, bêhêvî û bêşûur in ku iradeya xwe li ber postal û qundaxen çekên van siyasiyan radixin da binpê bikin, qetil bikin. Kurdino, súcdarê esasî em in. Em bi xwe pê qeyil in, rê didin, bêdeng dimînîn an piştgiriyê didin ku ev siyaseten han di nava me de rewacê bibîn. Heke siyasiyên Kurdan bidîtana ku milete Kurd tu carî siyaseten wiha qebûl nake, li pey siyaseten wiha naçe û bi şiddet red dike, wan cesaret nedikirin û imkan nediditîn ku vê siyasete li nav civaka me bimeşîn. Me bazar vekiriye, em qîmet û perê xwe didin, siyaseten wiha ji bo xwe dikirin ku loma jî ew tînîn li nav me difroşin! Divê em bîzanibin ku çareserî ji me destpê dike, heta em muşterî bin wê firoşen vê siyasete hebin û wê ev di nava me de rewacê bibîne. Divê em idî bêjîn bes e! Bi querardarî rê li ber vê siyaseta qirêj a malwîranker bigrin.

Geli ronakbir bo ci hûn bê deng dimînîn, rabin ser xwe û berê xwe bidin millet, heqîqetê di çavê millî rakin da bîbîne û hişyar bibe!

Yan na dawî li vê leystika tîrajîkomîk nayê! Yan na, millet her wê berxê hustudirêjkirî û ew jî wê quesabîn destbikêr bîmîn!



Weftîn PDK û YNK'ê li Anqerê di bin çavderiya DYB, Ingilîstan û Tirkîyê de civiyan. Berpirsîyaren Turkmenen Iraqê ji beşdarê civînê bûn.

Lihevkirin mecbûrî ye!

PDK û YNK bi însiyatîfa DYA careke din hanîtin li dor maseyekê rûniştin û gelş û nakokî-yên xwe munâqşe kîrin. Wekî gelek caran protokoleke lihevkirinê îmze kîrin, bi hêvîdayine-kê ji maseyê rabûn. Herçiqas pişti lihevhatinê PDK'ê da diyarkirin ku di çend xalan de têbiniyên wan hene ji, civînê lihevhatinê wê pişti du hefteyan dom bikin.

Li gor protokolê wê teqerawestandin berdewam be, herdu alî ji wê riayetê pê bikin. PDK û YNK wê herêmên di destê xwe de biparêzin, dilên di destê xwe de serbest berdin, Hewlîr wê ji hêzên leşkerî bê valakirin, hukûmeteke nû wê bê avakirin, pişti hînek iştîqrar bi cî bibe, wê hilbijartîn cê bibin. Hatina gumrukê ya deriyê İbrahîm Xelîl bi awayekê hemû alî dilê wan têkeve cî wê vekirî be, çavdêri bê kîrin.

Gotinek tarîxnasâ heye; ji bo miletek xerabiyâ herî mezin ew e ku, tarîxa wan ji aliye hînekî din ve bê nivîsandin. Lî diyar e ku ew tarîxnas rastî bûyerek weha nehatine ku, neteweyek bi hev bikeve, sulhdarê(n) wî dijmin bin. Divê ji bo neteweyek ji wê yekê xerabtir tiştek tunebe; lê mixabîn rewşa van sê salên dawiyê ku başûrê welatê me ketiyê ev e. Carna İran bangî PDK û YNK'ê bo lihevkirinê dike û ew ji didin dû hev diçin Tahranê û carna ji Tirkîye dibe qada lihevhatina wan. Van demê dawiyê Seddam Huseyîn bangî wan dikir digot "werin em xwe bi xwe li hev bikin".

Destê DYA'yê ji yê İran û Tirkîyeyê ewletir e

Ev hevdûditinê dawî bi însiyatîfa DYA (Dewle-tên Yekbûyî yê Amerika) çêbû. Pişti, aligîrê wezîrê derve yê pirsên Rojhilata Navîn Robert Pelletreau hat Tirkîyeyê, roja 21'ê Cîriya Pêşîn bi serokê PDK'ê Mesûd Barzanî re li Silopî û du roj pişti wî ji bi serokê YNK Celal Talabanî re li Ankarayê ci-vîn çêkir û li ser teqerawestandinê û ji bo destpêki-rina prosesa gelşen xwe bi guftugoyan çareser bikin, lihev kîrin. Di encama van hewldanan de DYA di 30-31'ê Cîriya Pêşîn de li Ankarayê bi besdariya nûnerên Tirkîyê, İngîlistanê û Robert Pelletrau, delegasyonê PDK û YNK dest bi guftugoyan kîrin. Pişti lihevruñiştinê du rojan protokoleke lihevkirinê îmzikirin.

Heger PDK û YNK lihev bûna, wek herdu salên pêşî yê Kurdistana federe dom bikirana, wê ne hewcebûna ku tu kes têketa navbera wan. Pişti diyar dibe ku li hev nakin û bi riya hêzên sêyem yê Kurda li hev nakin, ya çêtir ew e bi navbêncîtiya DYA li hev bikin, ne bi ya İranê an dewleteke din a dijmin.

Helbet, berjewendiyê DYA hene, loma serê xwe bi wê pîrsê dêşme. Bill Clinton bi xwe acizîya xwe ya li ser şerî Kurdan anî ziman û got ew bi vî şerî xwe nahêlin em bêtir alîkariya wan bikin. Berjewendiyê DYA ci ne? DYA helwesta li dijî Seddam Huseyîn, ji xwe re wek pîrsê prestijî dibîne. Heta Seddam Huseyîn li ser hukum be, DYA naxwaze politîka xwe ya tecrîtkirina İraqê biguherîne. Kurd ji li İraqê yek ji hêzên sereke ne û ev hêz li dijî Seddam e, zeîfbûna wê hêzê, Seddam Huseyîn xurt dike û şansê berdewambûna politîka DYA lawaz dike.

Ev berjewendiyê DYA, bi yê Kurda re, heta Seddam Huseyîn li ser hukum be, lihevkirî ye, lê DYA tu garantî nade Kurda ku pişti Seddam Huseyîn, wê rewşa wan çibe. Lî qandî diyar dibe, li gor rewşa iro DYA, heta Seddam Huseyîn li ser hukum be, statuya Kurdistana Başûr ya İroyîn garantî dike. Destê DYA ku iro dirêji Kurda dike, ji yê Tirkîye, İran, Suriyê û İraqê ewletir

e. Ev çil sal in serokê Kurdan di navbera Bexdad û Tehranê de çûn û hatin, lê tu tiştek bi ber hev de neanîn. Ji xwe rewşa iro ya Kurdistana Başûr encama siyaseta DYA ya li hember Seddam Huseyîn e, ne ji vê helweste be, di 24 seetan de İraq, Tirkîye û İran kevir li ser kevirekî nahêlin.

Giraniya Tirkîyeyê li Kurdistanê zêde dibe

Rola Tirkîyeyê di pîrsa Kurdistana Başûr de roj bo roj zêdetir dibe. Beriya şerî navxweyî rola Tirkîyeyê li Kurdistana Başûr, gelek kêm bû. Di dema guftugoyen Dublînê de zêdetir bû, wê ji wek terefek di civînê de ciyê xwe stend. Lî pişti PDK û YNK'ê li Dublînê ji li hev nekirin, şerî wan hîn grantir bû û ji bo lihevkirinê careke din li Anakarayê hatin ba hev, rola Tirkîyeyê hîn zêdetir bûye. Tirkîye li gor ciwîna Dublînê, di ya Ankarayê de hîn bêtir dîtinê xwe da qebûlkirin. Li ser daxwaza Tirkîyeyê Turkmen ji di civînê de besdar bûn, di protokola lihevkirinê de parastina Tirkîyeyê, helwestgirtina li hember PKK'ê vekirî cî girtiye. Diyar e, heger her du hêz bi wê lihevhatinê ji qayil nebin, wê hîn bêtir lawaz bibin, hîn bêtir hewcîyî Tehran, Bexdad û Ankarayê bibin.

Tirkîye her çiqas di demek dûr û dirêj de li hember avayiya Kurdistana Başûr e ji, ji ber hin berjewendiyê xwe yên nêzîk û tersneketina helwesta DYA û nakokiyê wê yên bi İranê re, bi rola navbêncîtiyê rabû û bû mehzûbanê guftugoyan. Berjewendiyê Tirkîyeyê yên nêzîk ev in; DYA wê des-tûr bide ku Neteweyen Yekbûyî qismî be ji ambargoja li ser İraqê rake, petrola ku İraq bifroşê wê di xeta boriya Kerkük-İskenderûnê de derbas bibe û tîcareta di navbera İraq û Tirkîyeyê dest pê bike. Li gor lihevhatinê Turkmen wek terefekî tê dîtin û roleke ji hêz û rastiya wan mezintir didin wan. Çavdêriya lihevhatinê wê ji Anakarayê bê kîrin.

DYA'yê ev rol bi kêfxweşî neda Tirkîyeyê. DYA ji bo politîka xwe ya li hember Sadam bidomîne û statuya Kurdistana Başûr muhafaza bike, mecbûrî Tirkîyeyê ye. Kurd ji ji bo têkiliyê wê û dînyayê berdewam be mecbûr e ku bi hindikayî bi dewlettek cînar re li hev be. Dewleten cînar ji her çar dewleten ku Kurdistan dagîr kirine û neyar in. Tu yek ji wan ji ji statuya iro ya Kurdistana Başûr ne-râzî ye. Lî di eynî wextê de, dijîtiyên wan her çar dewletan ji li hember hev hene û bi hev ne bawer in. Di rewşa iro de ji her çar dewletan, deriyê Tirkîyeyê vekirî be hîn baştir e.

PDK û YNK mecbûr in li hev bikin

Herdu hêz di tarîxê de bi salan e, bi hev re şer dijîn. Van sê salên dawiyê ji berê çekên xwe dane hev, ji bo zora hev bibin, tişfîn ku nabe dikin, bi tawîzîn mezin ji neyarêñ xwe sîlehan digrin ji bo qîra hev bînin. Lî vê ji pere nekir. Divê ew ji êdî fêm bikin ku ew nikarin bi şer hev û din biqedînîn an bê tesîr bikin, dema yek ji wan destê xwe dirêjî welatek neyar dike, yê din destê xwe dirêjî yê we-latekî din yê neyar dike. Her du hêz, hêzên sereke ne, divê li hev bikin. Bêyî lihevki-rinê tu rê tuneye. Divê êdî ev yek baş fêm kiribin ku mecbûrî hev in, divê ji hev re tenezul bikin.

Hîn tiştê negatîv yê nivîskarêñ Kurd

SENAR ŞAHÎN

Rewşenbir û nivîskarêñ Kurd naxwînin!

Divê mirov beriya ku binivîsîne, baş bixwîne. Nivîskarekî baş divê beriya hertişî xwendevanevêkî baş be. Nivîskarêñ navdar bi qasî kû dînivîsinin, du ewqas ji dixwînin. Lî mixab in ku nivîskar û rewşenbirêñ Kurd tev ne wusa ne, bi pirranî ew naxwînin. Hînekî ku gellek baş dixwînin ji di nav wan de hene lê ew hîndik in, pîrrîn wan naxwînin lê hima bi tenê dînivîsinin. Ez li der û dorêñ xwe gelek nivîskarêñ Kurd dibînim ku bi rastî ji kêm dixwînin. Li vir mabesta min xwendina pirtûkêñ Kurdî ye, lê ew pirtûkêñ İngîlîzî, Almanî, Swêdî û Tirkî dixwînin. Ew Bi Kurdî pirtûk dînivîsinin, lê bi Kurdî naxwînin.

Bi nivîskar û rewşenbirêñ Kurd re ruhê kolektifizmê tuneye!

Di nav hînek rewşenbir û nivîskaran de yekperistiye xurt heye. Ruhê xweperestiyê di mejiyê wan de rûniştîye û ew bi kesekî din re nikarin bixebeitin. Herweha gellek ji wan têkilî nav karêñ kolektifî nabin û bi wan re ruhê kolektifîye kêm e. Ew xwe durî partî û rîexistimêni siyasi dikin û tu wezîfeyeke cîvakî bi rîk û pêk nayinin cih. Bi gel re têkiliyê wan kêm in an tune ne.

Nivîskarêñ Kurd berhemkar nîn in!

Nivîskarêñ Kurd ji hîla astrandina berherman ve jîr nîn in, ew tembel in, naverokêñ berhemên wan qels in û ew lêkolînê berfi-reh nakin. Di berhemên wan yên lêkolînî de belge hene, lê şîrove-kin (yorum) tunc ne û xuya ye ku metodêñ lêkolînvaniyê baş nizanîn. Di gelek babetan de wan xwe negîhiştândiye û hemû tiş xistîne nav hev. Mîrik hem lêkolînvani hem helbestvan e, hem weşanvan hem rojnamevan e, hem zimanزان hem dîrokzan e, yanî tu cî bibêjî ew e.

Rewşenbir û nivîskarêñ Kurd bêbawer in!


Rewşenbir û nivîskarêñ Kurd bi bawerî nîn in. (Ne hemû rewşenbir û nivîskar lê hînek jê wusan in.) Yan bir û bawerîyeke wan ya xurt tîne yan ji ew li gor demê, li gor modayê hertim tê guhertin. Demek şoresser û sosyalist in, demek din dibin demokrat û liberal, azadiya'fikri diparêzin, lê keysa wan bê nahêlin ke-sek fîkrî xwe eşkera bibêje. Kesê ku rexne li wan bigre, wî dijimi-nê xwe ilan dikin. İmkaneke piçûk bikeve destê wan wê wek dîk-tatoran bi kar tînin. Di eslê xwe de bê bîr û bawer in.

Rewşenbir û nivîskarêñ Kurd ji hev hez nakin!

Di nav hemû rewşenbir û nivîskarêñ cîhanê de aliyeñ wan yên negatîf hene. Gelek nexweşiyêñ taybîf yên ronakbîr û nivîskaran hene lê jihevnehezkirina wan wek nexweşîya zeqemî ye. Pir têt gotin ku: "Ronakbîr gûrén hev in, hevdu dixwin." Ev gotin ji bo gelek rewşenbir û nivîskaran rast e. Nivîskar ji hev dihesidin, berhemên hev naecibînin û li pişt hev bi hevdu tinazan dikin. Têkiliyê germ di nav wan de tûne ne, ew ji hev re nabin alîkar û timî li dijî hev in. Rewşenbir û nivîskarêñ Kurd, rewşenbir û nivîskarêñ neteweyek bindest in, divê di nav wan de ewqas dijîtiyê tunebe. Birrek rewşenbir û nivîskar li ser navê rexnê dijiminahiya hev û du dikin. Ew dijiminahiya wusa xwe dide xuyakirin ku édi kovare-ke edebî hewce dibîne ku bibêje: "Kovar bi tu kesî re û tu rîexisti-nê re dijiminahiye naake, ji dijiminahiya kes û rîexistinan dûr e". Bi vê ji tê xuyakirin ku Kurd wek nesla kew dijiminahiya hev dikin. Li dora xwe binihîre bê ka rewşenbir û nivîskarêñ kîjan welatî bi qasî yên Kurdan dijî hev in?

Li ser nivîskarêñ Kurd mirov dikare gelek tiştan bibêje. Aliyên wan yên negatîf gelek in. Gotineke Tirkî heye, dibêjîn "Yarasi olan gocunur" yên ku birîna wî hebe bîla vê nivîsa me bigire ser xwe, me ev tiş ji wan re gotine. Ew kesen ku bi çavnebarî û he-sûdiyê raporê negatif derheqî hînek nivîskarêñ din de amade dikin û didin dezgehêñ Swêdiyan, ew kesen ku nahêlin hînek nivîskarêñ Kurd ji fona nivîskaran alîkarî bigirin, ew kesen ku dibêje Kurmançî ziman nîne, pesnê zaravayê Soranî dide û di derheqê berhemên ku nivîskarêñ Kurd bi kurmançî dînivîsinin de raporê nebaş amade dike, ew kesen ku ji dezgehêñ Swêdiyan re "Musteşarı" dike, tu dibêjî qê ew li İraqê ye û musteşariyê dike.

Rexneyen min bi gelempêri ne û ne ji bo rencidekirina kesayetiya tu kesî ne. Loma ji di nivîsa min de, navê tu nivîskarekî yan ji ronakbîrekî derbas nabe. Lî ez bi hêsanî dikarim bêjîm ku dê gelek kes xwe tê de bibînin. Ger em li gor metoda psîkolojiya wan, wan binirxînin wê gavê dê hînek tiştê din derkevin holê. Lî divê mirov vê nexweşiyê ji holê rake çunkî Ev dijayedî, ev he-sûdiyê feyde nade tu kesî. Di nav nivîskar û rewşenbirêñ Kurd de biratî, biratî û dîsa biratî divê.



Ji 'dîn'ê weha re can qurban!

Cima ku di dema serdana serokwezîre Tirkiyeyê Xoce Erbakan de, serokê Libyayê albay Muammer el-Kaddafi got ku; "Divê di bin roja Rohilata Navîn de Kurd ji bijin û ew ji bibin xwedî dewlet" disa li Tirkiyeyê pêla şovenizmê li dar ket. Ci bigre hem rastê hem 'cep'ê wan, hem muxalefet hem iktîdara wan, hem medya hem unîwersityên wan hem bi yek dengi li diji vê beyana Kaddafi derketin; hinekan ew bi dînîti, hinekan bi diktatorî, hinekên din ew bi bedewiyê çolê îtham kirin.

Di eslê xwe de gotina ku Kaddafi di rûniştina fermî de bo serokwezîre Tirkiyeyê Erbakan anîbû zimên ne tiştekî nuh bû û ne ji cara pêşîn dihat gotin. Wî gelek caran beyanên wilo dabû û hergav piştigiriya gelê Kurd kiribû. Kaddafi îcar eşkere û bi zimanekî vekirî ku Tirk jê fahm bikin, li ser pîrsa Kurdi sekînî û beyî zimanekî diplomasî, dîtinê xwe anî zimên. Ne ew tenê gelek dezgeh, parlamentî, partî, serokwezîr, wezîrîn karê-barê derive yên dewletên cuda yên Ewrûpayê ji beyanên wiha dane û xwestine ji pîrsa Kurdi re hellek bê dîtin û ev pîrs bi riyeke aşî çareser bibe. Gava serokwezîr, serokdewlet û wezîrî karûbarê derive yên Tirkiyeyê derdikevin seredanen Ewrûpayê û bi partnerên xwe yên wan dewletan re rûdinê hergav pîrsa Kurdi tête rojevê û ji wan daxwaz tê kirin ku ew çareyekê ji vê pîrsê re bibînin. Li ser van gotinê Ewrûpayîyan berdevkên Turkan dişeqizin, serê xwe dixin ber xwe û nikarin bersîva wan bidin. Lî ew tenê ji xwe re argumenta terorê dîkin bahane û vê pîrsê bi "terora" PKK'ê ve girê didin û bi vî hawî xwe ji wan 'xelas' dîkin.

Cima wexta yekî wek Kaddafi vê pîrsê tîne rojevê berdevkên Tirkiyeyê weha dîn dibin? Bi rastî meriv têngihîje. Ma tiştîn ku Kaddafi gotiye ne rast in? Ma dînbûna Kaddafi di kuderê de ye? Ku em bêjin Kaddafi dîn e, wê gavê, êdî yekî dîn ji têngihîshiye ku di Rojhilata Navîn de pirseke weha heye û daxwaz dike ku ev pîrs çareser bibe, wê gavê divê meriv bişeqize û kumê xwe deyne ber xwe û bifikire. Ku hûn Kaddafi dîn dîbînin û xwe 'jîr' dihesibînin, meriv ji jîrbûna we şik dike. Çunkî karênu ku hûn dîkin ne karê dînan, karê zirdîna ne. Ma kesê parî aqil di serê wî de hebûna wek

we dikir. Ma aqilê merivan hebûna meriv dikaribû hebûna milletekî berbiçav încar bike, ziman û kultura wan asîmle bike? Ma karê aqilan e meriv bi darê zorê mîletekî ji navê rake, gund û bajaran wan wêran bike Ma karê aqilan e meriv butçeya xwe endeksê şerê Kurdistanê bike û xelkê xwe birçî û tazî bihêle? Ma karê aqilan e herroj bi dehan kes bêñ kuştin; nefret û kîn di navbera gelê Kurd û Tirk de pêl bide? Ma karê aqilan e hûn siyaseteke gemarı li dij gelê Kurd dajon û kesen ku ji ber siyaseta we ya hov û har gund û bajaran xwe terk dîkin û ji bo debara xwe bikin jîn û keçen wan li bajaran metropolan xwe bifroşin? Ma karê aqilan e we gelê Kurd û Tirk kiriye dijiminê hev û şovenizm li dar xistiye? Ma karê aqilan e we nîvî ordiya xwe li Kurdistanê bi cîh kiriye û hûn li hemberê cîranen xwe siyaseteke şoven dajon? Ma karê aqilan e meriv Mem û Zîna Ehmedê Xanî qedexe bike, kelepç-

Xwezi hemû berdevkên dewleta Tirkiyeyê, serokê partî û dezgehêne Tirkiyeyê ji wek Kaddafi ji mîj ve 'dîn' bûna û wek wî bigotana ku Kurd birayêne me ne, ci mafêne me hene bila yê wan ji hebin û di bin tava Rojhilata Navîn de ew ji wek me bi azadî û serbestî bijîn. Wê gavê dê ne evqas xwîn bihata rijandin, dê ne evqas gund bihata valakirin, dê ne evqas insan bihata surgunkirin, dê ne evqas aboriya Tirkiyeyê tar û mar bubûna, dê ne evqas cinayetên qesasnediyar û infaz hebûna, dê ne "ozel tîm" û ne ji gerilla ava bibûna, dê ne hêşir ji çavên dayikan biherikiyana, dê ne hawara zarokan bihatana û dê ne "cuma" û ne ji "cûmartesi anneferî" peyda bûbûna.



FARIS CAN

eyan li desten rojnamevan û nivîskaran xe? Ma karê aqilan e meriv kaseten Kurdi yê muzîkê û vîdyoyê berrev bike û di derheqê xwediyê wan de dawe veke? Ma karê aqilan e meriv pîşîya insanan bi insan bide xwarin? Ma karê aqilan e di dawiya qîrnê 20'an de we mafê jiyanê xistiye bin lingên xwe û guh û çavên xwe ji hawara gelê Kurd re girtiye? Ku bi aqilbûn û jîrbûn ev be, bila aqilbûn û jîrbûna we ji we be, ez 'dîn' wek Kaddafi tercîhi 'jîrbûna' we dikim. Can qurban ji 'dîn' wek Kaddafi re.

Xwezi hemû berdevkên dewleta Tirkiyeyê, serokê partî û dezgehêne Tirkiyeyê ji wek Kaddafi ji mîj ve 'dîn' bûna û wek wî bigotana Kurd birayêne me ne, ci mafêne me hene bila yê wan ji hebin û di bin tava Rojhilata Navîn de ew ji wek me bi azadî û serbestî bijîn. Wê gavê dê ne evqas xwîn bihata rijandin, dê ne evqas gund bihata vala kirin dê ne evqas insan bihata surgunkirin, dê ne evqas aboriya Tirkiyeyê tar û mar bibûna, dê ne evqas cinayetên qesasnediyar û infaz hebûna, dê ne "ozel tîm" û ne ji gerilla ava bibûna, dê ne hêşir ji çavên dayikan biherikiyana, dê ne hawara zarokan bihatana û dê ne "cuma" û ne ji "cûmartesi anneferî" peyda bûbûna.

Ne azadiya fîkrî ne ji pîrsa Kurdi di bîra wan de ye

Di dawiya qîrnê 20'an de hîn li Tirkîyê azadiya fîkrî û demokrasî tuneye. Kurd ji mafêne xwe yên demokratik û neteweyî bêpar in. Rêxistinê navneteweyî, Parlamento û Konseye Ewrûpayê hergav bala meclîs û hukûmetî Tirkîyê kişândine ser van pîrsan, lê mixabin ew guhîn xwe ji van daxwazên Ewrûpiyan re digrin û ji bo hewwelatiyê xwe ne qanûnên xwe yên anti-demokratik û ne ji qanûnên ku ber azadiya fîkrî astengen digehurînin. Herçiqas berdevkên hukûmetî car carna bahsa guhertinê qanûnên xwe yên anti-demokratik dîkin ji, di pratîkî de, tu gav nayê avêtin, bilekis ronakbîren Kurd û Tîrkan di bin tehdîd û êrîşa dewletê de ne. Di girtîgehan de qetliaman çedîkin, işkenca xwe berde-wam dîkin, hejmara kesen ku têñ girtin zedetir dibin.

Rojnamevan, nivîskar, weşener ji ber nivîs û kitêbên xwe têñ girtin cezayen hefsê ji bo wan têñ dayin. Rojnameyên demokrat û bi taybetî ji yên ku ji aliyêñ Kurdan ve têñ derxistin hemâ ci bigre di derheqê hemû hejmaren wan de dawe têñ vekirin û polîs dest datîne ser wan. Fikir û bîrûbaweriyeñ xwe gotin û nivîsandin li Tirkîyê sîc e û cezayen wê ji heps û kelepce ne.



Devr-i saadet(Fotokatur: Ergun Akel) Ji rojnameya Milliyetê

Nivîskarê bi navûdeng Yaşar Kemal, hunermendê navdar Şanar Yurdatapan, rojnameyan Ragîb Duran û bi dehan kesen din hatin girtin û cezayen hefsê xwarin. Di derheqê Çetîn Altan de mehkeme hat vekirin.

Xala 8'an a anti-terorê wek "Şûrê De-

mokles" li ser hustiyê ronakbîr, nivîskar û rojnameyan e.

Yaşar Kemal ji ber ku di kitêba "Ji fîkrî re azadî" de dîtinê xwe nivîsandibû û nameyeke danerê Cumhuriyeta Tirkîyê Mistefa Kemal ku di derheqê Kurdan de otonomi xwestibû di nivîsa xwe de eş-

kere kiribû di derheqê wî de berê mahkeme hat vekirin û dawiyê ji sal û nîvîkê ceza girt ku dê di van 5 salan de ew nikaribe binivîse û çap bike. Ü ji bo vê yekê ji terka Tirkîyê kir û hat Swêdê.

Dostê gele Kurdish Şanar Yurdatapan - ku yek ji danerê Komîteya Aştiyê ye - ji ber axaftineke xwe ya di MED-TV'ê de di derheqê wî de mahkeme hat vekirin û ew avêtin girtîgehê.

Rojnameya heftane Ronahî ku ev salek e di bin êrişâ dewletê de jîyana xwe didomand, ji ber sebebêñ bêbingeh hate girtin û di derheqê berpirsiyaren wê de dawa hatin vekirin. Hemû hejmaren rojnameya heftane ya Tîrkan û Kurdi NûRoj hatin berevkirin û di derheqê berpirsiyaren wê de cezayen hefsê û yê pereyan hat dayin.

Hukûmet Refahîyolê ji wek hukûmeten dîn ku heta nuha ava bûne ji pîrs û pîrsîgirêñ gelê Tirkîyê û Kurdistanê re tu çare nedîtin; xeyîf bûhabûn û birçibûnê guhartineke berbiçav di jîyana gel de çenekirin. Bertîl, kuştin, işkence, zulm, xwekuştin, xwefirotin kirine parçayekî jîyanê û bê edaletî, bê huqûqî, bê demokratî, bê azadiya fîkrî û mafê mirovi civata Tîrkan û Kurdi xistine cendereyeke û ew ji li ser vê cenderê devr-i saadeta xwe didomînîn.

amadekar: HESEN MİDEN

ZANIST TEKNİK

Telefonê Mobil -2-

(Sistemê radyotelefonî selularî giştî)

VACLAV ZALUD

3-Bi gelempêri pesnê sistemê radyotelefonî selularî giştî

Wêne 4 ta radeyekê bi awakî hesanî texlitekî ji sistemê radyotelefonî selularî giştî darîçav dike. Di wêne de em navendeke telefonî stasyonarî adetî dibûnîn. Ew navend ji aliye kî ve bi telefonê têlî ve girêdayî ye û ji aliye kî ve ji bi navenda radyotelfonî ve girêdayî ye. Navenda radyotelfonî ji wê bi hemû istegehê bingehî ve girêdide. Di vê sistemê de dive, ku navenda radyotelfonî di her kîlîk de zanibibe, ka her istegehe mobil (telephone mobil) di kîjan şanê de ye. Ev dihêle ku mirov bikaribe ji telefonê stasyonar bigehe her istegehe mobil, bêyî ku pêwist bike, da sistem bêsûd li hemû şanan bigere û barê torê giran bike.

Naskirina cihê istegehê mobil bi vî awayî dibe: istegehê mobil di rîjîma aktiv de (çaxê ku ew pêxistî be, bere neaxive ji) bi şeweyekî peryodî li koma kanalên taybetî yên kontrolê digere. Ev kanalên taybetî ji aliye istegeha bingehî ve hatine dan û ji pîvana wan signalar derdi keve, ka kîjan signal ji hemûyan bi hêz e, ew bi xwe bêhtirê caran signalê pêlweşenâ herî nêzîk e. Her istegeha mobil her kîlî bi awakî automatikî hemû agadariyê pêwist diwergire û dizane ka ew di kîjan şanê de ye. Piştre ew bi xwe ji agadariyê digehêne istegeha bingehî û xwe li ser frekvansa wê kokdike. Istegeha bingehî ji informasyonê wê li cem xwe tomardike û eger guherandineke nû qewimî ew wê rastdike. Helbet her kîlî rewş tê guhertin û tiştên nû diqewimin, lê di nav demênu ku istegeha mobil li signalê herî bi hêz digere û ta yeke nû dibîne, ew li ser pêla herî bi hêz u baş, ya kevn kokkirî dimêne. Ew bê rawestan ji datayênu ku bi ser de diherikin dêkod dike û eger jimara xwe ya radyotelefonî di nav wan datayan de bibîne ewê yekser nasbike.

Piştî ku istegeha mobil jimara xwe di nav datayêne wêşandî de dibîne, ew agadariyê ketine rastê ji istegeha bingehî re dişiyêne. Komputerê istegeha bingehî ji nav koma kanalên axaftinê, yên wê şana ku istegeha mobil tê de ye, kanelekî vala dibijêre. Istegeha bingehî jimara vî kanalê vala dide istegeha mobil, ew ji xwe li ser frekvansa vî kanalî kokdike. Piştî van têkilyan tev ji nû ve êdi istegeha mobil agadriyeke akustikî (dengî), yan ji optikî (roniki) radigehêne û axaftin dikare were pêka-

Tablo 1-Parametrên bingehî yên sistemên selularî yên ku iro tenê bi kar anîn

Nişana sisemê	destpêk	bendên frekvensi (MHz)		multiplex+ modulasyonê	ferhbûna bendên kanalan (kHz)	xurtbûna biten datayı (kbit/s)	ferhbûna komikan	hijmara kanalan	sîtema hand-over	hijmara welatên sistemê bikartênin	hijmara istegehê mobil (milyon)
		BS _{Tx}	MS _{Tx}								
NMT 450	1981	463-467.5	453-457.5	FDMA FM +/- 4.7 kHz	25 20	1.2	60	180 225	C/N BS	14	15
AMPS	1983	869-894	824-849	FM +/- 12 kHz	30	10.0	7	832	C/N BS	37	9
TACS (ETACS)	1985	935-950 917-933	890-905 872-888	FM +/- 9.5 kHz	25	8.0	7 12	1000 1640	C/N BS	21	2.5
NMT 900	1986	935-960	890-915	FM +/- 4.7 kHz	25 12.5	1.2	7	1000 2000	C/N BS	8	0.5
JTACS	1979	925-940	870-885	FM +/- 5 kHz +/- 2.5 kHz	25	0.3	14	600	C/I	1	2
JNTACS	1988				12.5	2.4		1200 (2400)		9	
C-Net	1985	461-466	451-456	FDMA +/- 4 kHz	20	5.28		222	derenbûna veguhastinê asistence MS	3	0.5
GSM	1992	950-960 (935-950)	905-915 (890-905)	TDMA (GMSK)	200	271	4	600		24	nedîyar e

în. Lê vêca ciger xwediyê istegeheke mobil bi xwe bake xwediyê istegeheke mobil din, yan ji xwediyê telefonêke din ji tevahya sistemê, hingî ew prosesa li jor hatî gotin, tev careke din diqewime, lê bi berevajî diqewime.

Ji ber ku kanalên du şanên çîran ji hev cuda ne, pêwist e dema ku istegeha mobil sînorê nav di du şanân derbas bike, ew xwe li ser pêlîn kanalên şana nû kokbîke. Ev proses di hemû sistemê modern de tê bikaranîn, bêyî ku pêwist bike, da xwediyê istegeha mobil bi xwe têkelî wê bibe. Ev proses bi saya kanalên kontrolê, yên istegeha bingehî pêktê. Eger istegeha mobil bi riya van kanalên kontrolê dît, ku kvalita wan kêm bûye û kanalên baştır peydedibin, êdi ew van agadariyê dide navenda radyotelfonî. Ew vê agadariyê li cem xwe tomandike û kanalekî baştır dide istegeha mobil. Ev peywendiyê ku hatine şirovekirin, tev di demeke geleki kurt de pêk tê, ku ew ji çend milisekundan nedirêjtir in û haya xwediyê istegeha mobil ji wan tiştan hemûyan nîne. Ji kokkirina automatikî re, dema ku istegeha mobil ji şanekê derdi keve û dikeve nav şaneke din de, bi Ingîzî hand-off yan ji hand-over (bêyî bikaranaîna destan) tê gotin. Em ji bîr nekin, ku şirovekirina buhûrtî pesnekî gelempêri ye û ne bi sistemêke taybetî ve girêdayî ye.

4-Taybetiyên sistemê radyotelefonî selular

Di dema iro de li cihanê çend tipêr cuda, yên sistemê radyotelefonî selular, têne bikaranîn, ji sistemê analogî kevn bigire ta bi yên modérnî xwedî modulasyona digital. Eger em cudabûnên hûr nedine berçavan, em dikarin van taybetiyên hevbeş di nav wan de bibînin:

1.Kapasîta mezin, ku di praktikê de têra her kesê ku istegehê mobil bixwaze, dike.

2.Hesanîbûna guhertina rûber û hijmara şanân li gor cih û war, û li gor intenzîta bikaranîna kanalên pêwist.

3.Hesanîbûna piçûkkirina rûberê şanân û intenzîta bikaranîna kanalîn di pêserojê de li gor demê.

4.Kontrola navendi ya hemû sistemê radyotelefonî ku dihêle, da ji ku dibe bila bibe, li her derî bes yek ji mara radyotelefonî tê bikaranîn.

Ev xalên buhûrtî bi struktûra şanikî ve, ya sistemê ve girêdayî ne. Ev xalên jêr ji bi sistemê xwedî modulasyona digitali ve girêdayî ne, ku bi taybetî pirsa veguhastina bê şasîti û parastina veguhastinê li ber çavan dire:

5.Radeya bilind ya parastina veguhastinê li dijî guhdariya bi dizî, ku ticaran guhdariya bi dizî, bi métodên amatêrî nikare were pêkanîn û bi métodên pisporî ji ew pir çetin e.

6.Bikaranîna istegeha mobil bi tenê bi alikariya kartê kesane, yên SIM pêktê; xwediyê kartê dikare her istegeha mobil bikarbêne, helbet bihâyê axaftinê ji berîka xwediyê karta SIM e, ne ji ya xwediyê istegeha mobil e.

7.Ferhkirina rîjûmên peywendiyan; ji bili erkê bingehî ku axaftina telefonî ye, veguhastina datayêne digital, faks, teletekst, videotekst, agadariyê alfabetî üyd dibe.

8.Pêkanîna axaftinê telefonî di bin mercen, ku sistemê din bi kêt nayê (weke di nîvê bajarên mezin de, di nav avayıyên bilind e, di cihêñ girtî de, di bin pirên hadnî de û hwd), diare bibe.

Tablo 2 - Kurtî û tevaya navên sistemê selular

Kurtî

Danas

AMPS	Advanced Mobile Phone System, (DYA)
NMT	Nordic Mobile Telephone
TACS	Total Access Communication System, (Britaniya Mezin)
ETACS	Extended Total Access Communication System
JTACS	Japanese Total Access Communication System
ADC	American Digital Cellular
JDC	Japanese Digital Cellular
C-Net	Cellular Network, (Almanya Federal)
GSM	Global System for Communications, (Komîteya Posten Ewrûpa)

5-Karakterên sistemê radyotelefonî selularî giştî

Îro li dinyayê nêzîkî deh sistemê radyotelefonî selularî giştî kardikin. Beşek ji karakterên wan yên bingehî di tabloya 1 de ne. Nav û kurte navên sistemân di tabloya 2. de ne. Di stûna sisyan de ya tabloya 1. de BSTX benda frekvensa pêlweşenâ bingehî ye û MBSTX benda frekvensa pêlweşenâ istegeha mobil e. Tipêr multiplexe û tipêr modulasyonê di stûna çaran de ne. Ferehbûna bendên kanal û li pey xurtbûna herikandina datan, ku bi bîtan tê pîvandin, di stûna pêncan de ne (ji bona sistemê analog xurtbûna herikandina sinalizasyona digital me daye ber çavan). Ferhbûna kanal, ku di stûna heftan de hatiye, pêwistiyê bi şirovekirineke nêziktir dike, lê niha ev der ne cihê wê ye. Di stûna nihan de bi kurtî prînsipîn kokkirina automatikî, ya istegehê mobil, ku dema ji şanekê derbasî şaneke din dibin (hand-over); hatine. Weke ku diyardike, hemû sistem kembûna rîjeya signal/parazit ji bona hand-over bikartênin. Di stûna dawi de hijmara isegelê mobil li dinyayê ji sala 1993 an ve hatiye.


Gotina dawî

Di vê gotarê de agahdariyê bingehî li ser sistemê radyotelefonî selularî giştî hatine. Ev problematik geleki aloz û fireh e û di dema niha de ji ew pir aktuel e.

Çavkaniyê teknikî

Balston, D.M.. Macario, R.C. : Cellular Radio Systems. Artech House, London 1993.

*Jîkovara Amaterske Radio, 1. 1996
Wergêr: Zagrosê Hajo*



Wêne 4-Bi gelempêri raxistina sistemê radyotelefonî selularî giştî

”Lêgerîna folklorâ Kurdî pir zor e, mîna ku merov bi serê derziyê erdê bikole”

Nivîskarê me Seyidxan Kurij li ser zargotina Kurdi bi Ahmed Aras re peyi. Li jêr em vê hevpeyvinê pêşkêşî xwen devanên xwe dikan.

— Wek hûn jî dizanin li ser metoda karê folklorî pir munaqşe hene. Wek tê zanîn destanek herêm ji herêm, gund ji gund, dengbêj ji dengbêj cuda tê gotin. Tu çawa kilam û destana berev dikî û wan çawa bi kar tînî? Li gor dîtina te folklorâ bi zanistî çawa dibe?

— Kurdan hertiştê xwe di zargotina xwe de civandine. Ji bo me Kurdan zargotin gelek girîng e. Ev ne tenê dîtina min e, herweha Kurdnasen biyanî jî weha dibêjin. Ger Kurd edebiyata xwe ya devkî hîn nebin, lênegerin û berhev nekin di warê çandî de nikarin karê qenc bikin. Lê karê lêgerîna folklorâ Kurdî pir zor e, mîna ku mirov bi serê derziyê erdê bikole. Bi ferdî bereykirina folklorâ Kurdî zahinet e, ev kar karê kolektivî ye. Divê meriv bi metodê zanistî kar bike û ji bo wê jî divê meriv berê her tiştî çerçewa xebata xwe tespit bike. Her destan û her kilam gelek wariyantên wan hene. Ez dixwazim destana ”Kerr û Kulik” wek nimûne bidim. Min 3-4 wariyantên wê berhev kirin. Kurden Rewanê jî çend wariyantên wê berev kiribûn. Min ew jî xwendin. Meriv dikare van destan û kilaman bi wariyantên wan ên cuda biwesine, lê ew nabin destan. Divê meriv hemû wariyantên wan bîne berhev, ji wan wariyantân wariyanta herfî tekûz bigre, eger kîmasî hebin ji wariyantên din temam bike, yanî divê meriv rastiya wê bigere û derxe meydanê. Hînek dengbêj pir mubalaxa dikan, divê meriv guh nede nubalaxan. Lê di destanan de tiştîn mitolojik hene divê meriv guh xwe bide wan.

Destan jiyana Kurdan a kevn nişan di-de. Destan jiyana Kurdan a cîvakî, danû stendinên wan tîne berçavan yanî destan mantelîta Kurdan derdixîne holê. Li gor tarîfa ansiklopediyan jî destan neyrika rewşa jiyana gelan in. Hemû rojhilat-nas dewlemendiya zargotina Kurdi qebûl dikan. Eger haya meriv ji dîrok û jiyana Kurdan ya dema buhûrî nebe, mirov ni-kare romana Kurdi jî binivîse.

Ji aliyê din berhemên folklorî alîkariya pêşveçûna zimanê Kurdi jî dikan. Kila-mân Kurdi buyarê dîrokî jî tînin zi-mân. Gelek kilam hene ku di dema Cumhûriyetê de ci hatiye serê Kurdan tî-

nin zîmân. Dîsa kilamên dîrokî hene li ser serok û lehengên Kurdan hatine go-tin.

Yekî ku kilamên Kurdi yê klasik ni-zanibe nikare muzika Kurdi ya modern jî baş çêke. Divê hozan motîvên kilamên Kurdi yê klasik zanibin ku bikaribin bi enstrümentên modern sentez çêkin. Mirov dikare roka Kurdi û popa Kurdi jî çêke lê têde divê muhaqeq motîvên mu-zika Kurdi ya klasik hebin.


— Danûstendina destanan bi dîrokê re çî ye? Gelo bi wasiteya destanan meriv ka-re dîroka mîletekî fîr bibe yan na?

— Alaqeya destan û dîrokê bi hev re tûneye. Destan di dema kevnare de hati-ne gotin, dema wan ne kifş e û kes nizâne buyer kîngê qewimiye. Mirov nikare bi wasiteyan destanan li ser dîroka mile-tekî bigihîje agahdariyê ilmî. Ez tiştê wi-lo nabêjim. Ez dibêjim hin kilamên Kur-dan yê dîrokî hene ku di derqehe 100 salên dawiyê de agahdarî didin me. Mirov bi wan dikare hînek buyarê ku qewimîne fîr bibe. Mesala pey damezi-randina Cumhûriyetê gelek serîhildanen Kurdan çêbûne, li ser serok û lehengên wan serîhildanen gelek kilam hatine gotin, mirov bi saya van kilaman dikare derheqê wan serîhildanen de, objektîv agahdar bibe. Wek nimûne ez dibêjim; nêzîkî gundê me Alican û Seyidxanê Kerr hebûne wan di salên 1926-27’ân de li hemberî Cumhûriyetê serîhildane; li ser wan kilam hatine gotin, ev kilam di derheqê vê serîhildanê de agahdarî didin me. Li ser serîhildana Şex Seîd ji kilam hene. Dîsa di sala 1865’ân de serîhildana Begê Hozanê çêbûye dewleta Osmanî leşker şandiye ser, wê demê hukumdar-kî Kurdan bi navê Surmeli Mehmet Paşa hebûye ew li Elazığî, Agiriyê, Bazidê û Kaxizmanê hukumferman bûye. Surmeli Mehmet Paşa neviyê İshak Paşa ye ku bi 400 peyên xwe ve çûye şerê Hozanê. Li ser vê buyarê kilam hatine gotin, ev kilam di derheqê vê buyarê de agahdarî didin me.

— Li gor dîtina we, têkiliya destana ”Memê Alan” û ”Mem û Zîn” a Ahmedê Xanî ci ye? Gelo buyareke wi-lo qewimiye eger qewimiye kîngê û li ku derê?

— Buyara ku di Memê Alan de heye, ew qewimiye lê kîngê bûye em pê nizânen. Gelek kes hemfîkir in ku ev buyer

.... Eger destana ”Memê Alan” nebûya ”Mem û Zîn” nedihat nivîsandin. Ev rastiyek e. Eskereye ku ”Mem û Zîn” kîngê hatiye nivîsandin. Armanca Ahmedê Xanî bi nivîsandina vê poemê ew bûye ku ji alîkî ve zimanê Kurdi bike zimanê literatûrê, ji aliyê din jî ji xwe ew bi xwe dibêje; ”Mem û Zîn” ji xwe re kiriye bahane, ew li ser rewşa Kurdan a siyasî, cîvakî, li ser adet, tor û jiyana Kurdan agahdarî dide.



Ahmed Aras kî ye

Di sala 1943’ân de hatiye dunyê. Di sala 1963’ân de di kovara ”Dîcle Fîrat” de dest bi karê nivîsandinê kiriye. Di sala 1969-1970’yi de di kovara ”Ant” û ”Emek” de nivîsên wî çap bûne. Di navbera salên 1972 - 1978’ân de li Swêdê bi cî bûye. Di sala 1978’ân de vegeriya welêt. Di dema cûntaya 12’ê îlonê de hat girtin. Nuha li Îzmîrê jiyana xwe didomîne û li ser folklorâ Kurdî xebat dike. Di salên 1964 û 1965’ân de li Serhedê kilam û destanên Kurdi berhev kirine. Li ser jiyana Evdalê Zeynikê xabata wî heye. Heta nuha destana ”Kerr û Kulik” û destana ”Siyabend û Xecê” wek pirtûk weşandiye. Niha di destê wî de waryantên cûda yê destana ”Memê Alan”, ”Filîte Quto”, ”Derwêşê Evdi” û ”Elî Xarzî” hene û li ser wan dişxule.

berê İslamiyetê bûye. Ev destan ji dema kevnare heta iro qîrn bi qîrn hatine gotin û pir tiştî lê zêde bûne, lê ci lê zêde bûne û rastiya wê çawa ye meriv nizane. Lê buyareka weha qewimiye ji ber ku destan bahsa cografya û bahsa navê insanî kiriye.

Ahmedê Xanî poema ”Mem û Zîn” ê li ser bingeha destana ”Memê Alan” da-mezi-randîye. Ez dikarim bibêjim ku, eger destana ”Memê Alan” nebûya ”Mem û Zîn” nedihat nivîsandin. Ev rastiyek e. Kifşê ku ”Mem û Zîn” kîngê hatiye nivîsandin. Armanca A. Xanî bi nivîsandina vê poemê ew bûye ku ji alîkî ve zimanê Kurdi bike zimanê literatûrê, ji aliyê din jî ji xwe ew bi xwe dibêje; ”Mem û Zîn” ji xwe re kiriye bahane, ew li ser rewşa Kurdan a siyasî, cîvakî, li ser adet, tore û jiyana Kurdan agahdarî dide. A. Xanî di berhemâ xwe de bahsa cejna Newrozê dike, lê destana ”Memê Alan” de cejna Newrozê nîne. A. Xanî ”Mem û Zîn” bi awayekî realist nivîsandiye hemû motîvên mitolojik jê derxistine. Lê dîsa jî bin-geha ”Mem û Zîn” ê ”Mem û Alan” e. Çimkî Qere Tacdin û herdû birayê wî; Beko Ewan, Mîr Sêvdîn, Mîr Cizîra Botan, Zînê û Sitî hemû di destanê de çewa hene di ”Mem û Zîn” ê de jî wisa hene. Gelek buyarê din jî di destanê de çawa bûne di ”Mem û Zîn” ê de jî wilô ne.

ZINAR SORAN

DI 27'ê Gulana 1960'ı de, cûntayê ke leşkerî dawî li desthilatdariya hukûmeta Adnan Menderes anî û desthilata dewleta Tirkîyeyê xiste destê xwe. Pişti vê mudaxeleyê bi çend rojan, di 1'ê Hezîrana 1960'ı de, ji gelek navçeyên Kurdistanê 485 axa, şex, serokesîr û kesen navdar hatin girtin û ew li bajare Sîwasê, li kampekê hatin civandin. Ew kes bi qasî şeş mehan, di vê kampê de girtî man. Pişti vê girtinê bi çend mehan, di 18'yê Çiriya Pêşin a 1960'ı de, "Qanûna sîrgûnê ya bi hejmara 105'an" ji aliye Komîteya Neteweyî ya Yekgirtî ve, hate qebûlkirin. Karbidestêne dewletê, ji nav wan girtiyan 55 kes neqandin û yên mayî berdan. Li gor qanûna sîrgûnê ya 105'an, ew 55 kes li Antalya, Burdur, Izmir, Muğla, Afyon, Isparta, Manisa, Çorum û Denizliyê hatin cîwarkirin.

Di nav wan 55 kesan de, kesen welatparêz ku di pêşdexistina tevgera netewe-yî de rol dilistin jî hebûn. Yek ji nav wan Av. Faik Bucak bû ku di pêş de ew dê weke hîmdar û serokê PDKT'ye derkeve pêsiya me. Cuntayê li hemberî gelê Kurdistanê siyaseta berê ya dewleta Tirkîyeyê ya nîjadperest û kolonyalist bi awakî dijwartir dimeşand. Karbidestêne leşkerî dixwestin ku bi riya zilm, zor û çavtir-sandinê, pêsiya şiyarbûn û pêşketina tevgera netewe-yî ya Kurdî bigrin. Di gotin-nen endamên Komîteya Neteweyî ya Yekgirtî de, ev helwest bi awakî vekirî derdiket holê: "Eger me tevgera 27'ê Gulanê pêk neaniya, wê welata me perçe bibûya. Ji ber vê yekê 27'ê Gulanê pêwîst bû" (1).



Karbidestêne leşkerî dijîti û dijminatiya xwe ya li hemberî gelê Kurd, ne tenê bi girtin û sîrgûnkirina wan kesan dan diyat kirin; herweha wan ev helwesta xwe di efûya giştî de jî berdewam kirin. Pişti ku leşkeran desthilat xistin destêne xwe, efûyeke giştî derxistin. Lê belê, Komîteya Neteweyî ya Yekgirtî 49 girtiyan siyasi yên Kurdan ji derveyî vê efûye hiştin. Cuntayê li hemberî gelê Kurd politikaya resmî ya berê ku li ser bingehê asîmlasyon û înkârê hatibû avakirin, bi awakî berfirehtir û dijwartir didomand. Pişti destguherandina desthilatiyê, li ser esasê înkârêna netewe-yê Kurd û zimanê Kurdî kampanyayê nû yên berfireh hatin li dar xistin û ji bona ku Kurd bi Tirkî bi peyiyivin jî program û hewldanen taybetî hatin meşandin. Navên gund, hinek bajar û navçeyên Kurdistanê yên Kurdî

hatin guherandin û navê Tirkî li wan hatin kirin. Ji bona guherandina navê Kurdî û Ermenî qanûneke taybetî ya bi hejmara 1587'an hat derxistin:

"Navênu ku ne li gor kultura me ya netewe-yî ne û qâideyên exlaqî, urf û adetên me û yên raya giştî diêşime, wê bêne guherandin" (2).

Karbidestêne dewletê, ji bo ku zarokên Kurdan ji biçukanî de, di nav kevirên aşê asîmlasyonê de hûr bihîrin, wan ji ziman, adet û kultura Kurdî bi dûr bixînin û bi kultur û birûbaweriyênen nijadperestîya Tirkan mezin bikin, dest bi avakirina "Dibistanê Herêmî yên Leylî" kirin. Ji bona avakirina van dibistanan, ji aliye Komîteya Neteweyî ya Yekgirtî de, di 5'ê Çileya Paşin a 1961'ê de, bi hejmara 22'an qanûneke taybetî hate derxistin. *Li gor xalê 6 û 9'an yên vê qanûnê, di sistema perwerdekirina Tirkîyeyê de sazûmaneke nû dîhate bi cih kirin. Armanca vê yekê ji, bêguman asîmlasiyona zarakên Kurdan bû. Heta sala 1970'yi, bi qasî 70 dibistanen weha hatin ava kirin. Li derdora 60 dibistanan ji van li Kurdistanê hatibûn ava kirin û yên din jî li Anatolyê, ew cihênu ku Kurd bi girseyî lê hebûn, hatibûn ava kirin* (3).

Li hemberî vê politikayê û van kirya-rêne kolonyalist û nîjadperest deng ji pêşverû, çep û demokratîn Tirkan dernediket. Lê rojname û weşanên Tirkan bi peymandariyeke mezin ji bo armanc û politikaya karbidestêne xwe dixebeitîn; bi şovenîstiyeke dijwar êrisî ser netewe-yê Kurd, welatparêz û rewşenbirêne Kurd dikirin.

Qanûna bingehîn a 1961'ê ji, li ser bingehê netewe-yîa Tirk û nîjadperestîye hate amade kirin. Hebûna gelê Kurd hante înkârîn. Mafê azadiyê tenê ji bo netewe-yî Tirk hebûn. Ji bo mirov li Tirkîyeyê bikaribûya ji "maf û azadiya qanûna bingehîn" istifade bikira, divyabû mirov Tirk bûya. Eger yên ne Tirk bûna û bixwestina ji "maf û azadiya qanûna bingehîn" istifade bikira, divyabû hebûna xwe ya netewe-yî înkâr bikiranu û xwe Tirk qebûl bikiranu. Ji bo ku vê rewşê dide diyar kirin, ez çend xalêne vê qanûna bingehîn yên di vî warî de li jêr dînîsim:

"Hakîmyet bê qeyd û şert ya netewe-yâ Tirk e" (xal: 4).
"Desthilatdariya hukumdayinê, li ser navê netewe-yâ Tirk ji aliye makhkemeyen azad ve tê xebitandin" (xal: 7).
"Her kesê ku bi hevwelatiyê bi dewleta Tirk ve girêdayî be, Tirk e" (xal: 54).
"Her Tirk mafê wî heye ku di kariîbârên gelemerî de bixebite" (xal: 58).
"Bêşdariya parastina welêt maf û wezife-

ya her Tirkî ye" (xal: 60).

"Her Tirkê ku sî salêne xwe dagirtibe, dikare parlamente bê hilbijartîn" (xal: 68).

"Di hilbijartînen Meclisa Neteweyî û Senatoya Komarê de, her Tirkê ku xwedî deng e, deng dide... Her Tirk dikare bibe endamî Senatoya Komarê" (xal: 72).

Tevî vê helwesta nîjadperest û kolonyalist ji, pişti qebûlkirina qanûna bingehîn a 1961'ê, bi hindikayî be jî di warê serbestî û azadiya giştî de, hinek pêşketin dihatin dîtin. Rewşenbir û welatparêxên Kurdan ji xwestin ji vê rewşa nû istifade bikin û dest bi hewldana weşandina hinek kovar û rojnameyan kirin. Di van kovar û rojnameyan de, bi awakî sergirtî ya jî sinorkirî be jî, li ser hinek derd û kûlêne gelê Kurd ji dihate rawestandin. Lê karbidestêne dewleta Tirkîyeyê tehâmulî vê yekê jî nedikirin. Ji ber zilm, zordarî û çavşoriya dewletê, ev kovar û rojname nedibûn xwediyejiyanekî direj. Ev zilm û zordesiya li ser kovar û rojnameyan Kurdî, bahoza firtoneyeke nû bû. Ji ber sedemê vê bêtehamulî û helwesta nîjadperest ya dewleta Tirkîyê, hinek xwendekarêne Kurd yên ji perçeyen Kurdistanê Iraq û Iranê hewl didin ku li Stenbolê liqekî "Komeleya Xwendevanen Kurd li Ewrûpayê" bi awakî veşartî damezîruin. Di 4'ê Hezîrana 1963'an de bi ferma wezirê karê hundur Hifzi Oğuz Bekata operasyoneke berfireh li hember xwendekar, rewşenbir û welatparêzên Kurdan dest pê kir. Polisîn siyasi yên Stenbolê, di eynê wext û seatê de avêtin ser malen Awûqat Ziya Şerefhanoglu, Musa Anter, Doğan Kılıç Şîhhanehanî, Sait Elçi, Medet Serhat, Edip Karahan, Enver Aytekin, Ali Anagür û ew girtin. Di vê operasyone de, 13 kes hatin girtin û bi dû re hejmara girtiyan gîhaşt 23 kesan. Ev, di diroka nêzîk ya Kurdistanê de, weke bûyera 23'an tê nas kirin.

Ji bûyera 23'an jî diyar dibe ku rewşenbir, xwendekar û welatparêzên Kurdan, ji bo pirsa Kurdî bînin rojevê, he-wildanen xwe her berdewam kirine. Lê ev hewildan û xebatêne dihatin kirin ji rêxistinê siyasi, demokratik, kulturi û meslekî yên Kurdan bêpar bûn. Pêwîstîya rêxistinîye her ku dicû, bêtir xwe derdixist pêş. Lê dewleta Tirkîyeyê bi tu awayî kês û firset nedida Kurdan ku komele û rêxistinêne xwe yên eşkere û demokratik damezîrinin.

Gava hat dîtin ku karbidestêne dewleta Tirkîyeyê tu maf, kês û firsete nadîn Kurdan ku di warê weşanî û çandî de jî xebatêne xwe bi awakî eşkere û demokratik bidomînîn; nerîna damezrandina rêxistinîye siyasi ya veşartî, bêtir derket pêş. Ji

P E Ş G O T I N

Milletê Kurd, Milletîkî tîrîxfî û kevne. Ew xwehîyê medenîyet û dewlet bû. Ew rastfa dîrokî nayî vegartîn. Dr jîna millctan de devrîn ketî û tarf hene. Van demande carna millet hînda dîbin, em di rûpelîn tarîfxade wan milletan dîbinin.

Bîndestfa milletan no hîndabûne, lewra hîndabûn: Tarfa millî, Ezînfya millî, Harsenî millî û Zimanî zîkma kî bîrvakirine. Millêtî Kurd, xwe hînda nekîrîye û cîtûne wîyîn millî û cîdîne. Lewra Millêtî KURD DÎJI.

Lê belê ev jîyan ne jîyanekî serfiraz û azayîfye.

Kurd, fro bîndestan. Heggân mirovanî û millî jî hâtîne sitîndin. Dexwazame û dcâzame: Milletê Kurd, wek milletan Cîhanî azad û serfirazbi.

Ji bona pêkanîna ARMANCA: (PARTİYA DEMOKRATA KURDISTANA TİRKİYE)

Hatîfe darîn. Xebata Partiyê, rexeki AŞTİ, Demokratî , Mirovanî û Komelâyftî dîmeşe.

Partî, Parastîyê "Mîsaqa Millîye". Lewra Partî, bawerîfî bi yekftî û bîroyftî û hemberîya Kurd û Tirk'a tînc.

Partî, alîkarê hemî Milletan êsfer, Partî yekftî û hemberîya heafî milletan qeboldîks. Hovkotina Milletande aştî dîrîzave û bawerîya Felseftî, DIN'î û fîkrîde, herkes aza û serbest digre.

Partî, bi "PEYMANA MILLİTEN YEKBOYT" ve, girêdayfye. Ü bi her aveyî xwînméjîfî (sûmûrgeyftîfî) naxweze û red'dike.

Di negeba rezîn Milletde, mucađeleyîkî gureşî qebul nahe.

Partî li alî nîzama HUQUQIYE, 16 belê di gespa heq-qanî insanî û millî de, ber'rabûn û şüregfî nîşandide.

PARTİYA DEMOKRATA
KURDISTANA TİRKİYE





Serkê PDKT Faik Bucak di xortaniya xwe de-sala 1947- (ji arşîva Zozan keça F. Bucak)

bo vê armancê, di nav rewşenbir û welatparêzên Kurdan de, danûstendin roj bi roj xurttir dibû. Lê di warê damezrandina rêxistîneke siyasi, illegal û serbixwe ya Kurdi de, rewşenbir, xwendekar û welatparêzên Kurdan weke hevdu nedifîkirin. Di vî warî de, êdî riya wan ji hevdu vediqetiya. Di wê demê de, hinek rewşenbir û xwendekarên Kurd ên çep û komunist di nav TIPê (Türkiye İşçi Partisi) û hinek komeleyên çepên Tirkan de cih girtibûn û bi wan re dixebeitin. Lê hinek welatparêzên Kurdan ji, ji bo damezrandina partiyek siyasi ya serbixwe û illegal dest bi hewldan û xebateke taybetî kribûn.

I- DAMEZRANDINA PDKT'YE

Piştî van guherandin, bûyer û pêşketinênu ku li Tirkîyê û li Kurdistana dibûn, çend rewşenbir û welatparêzên Kurd, ji bo damezrandina partiyek siyasi, serbixwe û illegal dest bi xebat, hevdîtin û hewldaneke taybetî kirin. Di encamê vê xebat û hewldanê de, "Partiya Demokrata Kurdistana Tirkîyê" (PDKT'ye) di 11'ê Tîrmeha 1965'an de, li bajarê Diyarbekirê û bi awakî veşartî (illegal) hate damezrandin. Di destpêkê de, Av. Faik Bucak ne di nav endamên damezrîner yên vê partiyê de bû. Partî ji aliyê Sait Elçi, Ömer Turhan û sê hevalên wan ku ji ber sedemên parastinê ez naxwazim navên wan binivîsim, hatibû damezrandin û Sait Elçi weke serekê Partiyê hatibû hilbijartin. Lê dûre Av. Faik Bucak ji ji bo endametiya damezrîner tê razî kirin. Destûr û programa PDKT'ye bi pêşniyaran Faik Bucak û lêzêdekîna pêşgotinê awayê xwe yê dawî digre û ew ji besdarî nav endamên hîmdar dibe. Piştî besdarîya Av. Faik Bucak, Sait Elçi ji serekîtiya Partiyê istifa dike û Faik Bucak weke serek tê hildibijartin; Dûrnas ji ji sekreteriya Partiyê istifa dike û Sait Elçi weke sekreterê PDKT'ye

tê hilbijartin. Naznavê Av. Faik Bucak yê di nav Partiyê de Zinar, yê Sait Elçi ji Pêşmergê Welat û yê Ömer Turhan ji Bendeê Welat bû. Ji ber ku endamên din yên damezrîner dijîn û min destûra nivîsandina navên wan yên rastî negirtiye, ez naxwazim navên wan binivîsim. Destûr û programa PDKT'ye bi hevdu re hatiye amade kirin û bi Kurdi hatiye nivîsandin. Di vê destûr û programê de, naznav û wezîfeyen hîmdarên PDKT'ye weha hatiye nivîsandin:

Serek: Zinar

Sekreter: Pêşmergê Welat

Mûhasib: Evîndarê Welat

Aza: Dûrnas

Aza: Jîrek

Aza: Bendeê Welat

Li gor agahdariyên ku Av. Şerafettin Elçi dide; di bîryargirtina damezrandina PDKT'ye de, roleke taybetî yê Fehmî Bilal (Fırat) çêbûye. Fehmî Bilal katibê Şêx Saîd bû. Ew extiyariya xwe dike sedem û naeve nav hîmdarên Partiyê. Piştî ku her pênc heval bîryar didin ku partiyek siyasi ya illegal ava bikin, ew di serriya Kurdistana Sûriyeyê re, destûr û programa Partiya Demokrat a Kurdistana Iraqê tînin. Jîrek Erebî baş dizanîbû û ew destûr û programê ji Erebî werdigerîne Kurdi. Ew ji vê destûr û programê istifade dike û li gor mercen Tirkîyeyê destûr û programa PDKT'ye bi Kurdi amade dike. Pêşmergê welat, Dûrnas, Evîndarê Welat, Jîrek û Bendeê Welat li ser program û esasê rêxistinê li hev dike û di 11'ê Tebâxa 1965'an de, li Diyarbekirê li bexçeyê Koşka Gazi sûnd dixin û Partiyê ava dike. Sait Elçi dike serok, Dûrnas dike sekreter û Evîndarê Welat ji dike muhasib.

Hayêن Faik Bucak û Kemal Badillî ji damezrandina Partiyê hebûn. Di amadekirina destûr û programa de afîkariya wan ji çebûne. Kemal Badillî xebatê

Sekreterê yekem yê Partiya Demokrat a Kurdistana Tirkîyê

Faik Bucak

(1919-1966)

Faik Bucak di sala 1919'an de li gundekî Swêregê, Hedroyê hat dinê. Malbata wî dewlemend û welatparêz bû. Dibistana seretayî li Swêregê, ya navîn û lîseyê li Rêha, Diyarbekir û Meletiyayê xelas kir. Di sala 1939'an de dest bi Unîversiteya Huqûqê ya Stenbolê kir û di sala 1946'an de xelas kir. Li gelek bajarên Tirkîyeyê hakîmî kir, di sala 1956'an de dev ji hakîmîyê berda û li Rihayê dest bi awûqatiyê kir.

Di dema Unîversiteyê û awûqatiya xwe de bi aktîvi siyasetê re mijûl bû.

Piştî inqilaba leşkerî ya 1960'î tevî 55 axa, şêx û serokeşîrên Kurdan surguni Sêwasê û ji li wir jî surgûnê Balikkesîrê bû. Piştî ku surguna wî xelas bû dîsa li Rihayê bi cî bû. Di hilbijartina 1965'an de di Partiya Adaletê de namzetiya xwe danî lê hat weto kirin. Îcar wek namzetê serbixwe ket hilbijartina û 17 hezar deng wergirt lê dîsa nehat hilbijartin.

Ji ber ku di dema "Buyera 49'an" de Serokê CKMP (Cumhuriyetçi Koçlu Millet Partisi) yê bajarê Rihayê bû, ew nehat girtin.

Di dawîya 1965'an de PDKT hat damezirandin û ew bû Sekreterê yekem yê Partiyê. Lê ev sereteriya wî dirêj najot, dewlet li hember wî di 4'ê Tîrmeha 1966'an de suikasteke çekir û şehîd ket.

xwe yên li ser ziman û nehezkirina xwe ya ji siyasetê nîşan dide û endametiya hîmdariyê qebûl nake. Faik Bucak, bi karakter û nerînên xwe û bi rûmeta xwe ya di nav civata Kurd de, ji bo seroktiya Partiyê kesekî ideal bû. Faik Bucak di destpêkê de dide diyar kirin ku ew vê gavê ji bo xebatê ne amade ye û ji bo vê ye-kê ji daxwaza hîmdariya Partiyê qebûl nake. Piştî damezrandina partiyê, hîmdarên Partiyê, du caran Fehmî Bilal dîşinin Rihayê cem Faik Bucak ku wî ji bona endametiya hîmdariyê Partiyê razî bikin. Faik Bucak vê daxwazê qebûl dike. Piştî Faik Bucak endametiya hîmdariyê qebûl dike, sekreterê Partiyê Dûrnas dihere Rihayê û li mala Faik Bucak li ser program û destûrê dixebeitin. Li gor daxwaz û pêşneyarên Faik Bucak guherandinê dawî tên çekirin. "Pêşgotin" li wê derê dikeve pêşîya programê û bi vî awayî li ser program û destûrê li hevdu dike. Faik Bucak tê Diyarbekirê û di 21'ê Tebâxa 1965'an de li Otela Turistikê sûnd dixwe û besdarî nav Partiyê dibe. Di wê rojê de, Sait Elçi ji seroktiya Partiyê istifa dike û Faik Bucak dike serokê Partiyê. Dûrnas ji ji sekreteriyê istifa dike û Sait Elçi dike Sekreterê Partiyê. Bi vî awayî damezrandina "Partiya Demokrat a Kurdistana Tirkîyê" awayê xwe yê dawî digre (4).

Di wê demê de, avakirina partiyek illegal ya Kurdi, ne ewqas hêsa bû; fedekarî û cesareteke gelek mezin jê re dixwest. Zilm û zordariyeke mezin li ser gelê Kurd hebû. Dewleta Tirkîyê, anti-propagandeyeke berfireh û politîkayeke dijwar ya asîmlasyonê li hember gelê Kurd dimeşand. Karbidesten dewletê ji bo ku çavê neteweyê Kurd bitirsîne û wî di nav kultura xwe de bîhilîne, gelek metodê hov û kirêt bi kar dianin. Wan hebûna neteweyê Kurd îñkar dikirin û ji bo ku vê derewa xwe têxe serê xelkê, bi profesor û doktorên pêşgirtiyen dewletê,

TÊBINÎ Û ÇAVKANÎ

(1) Yê ku ji Hikmet Kivilcimî, "27 Mayıs ve Yön Hareketinin Sınıfsal Eleştirisi", weşanên Ant, Stenbol, 1970, s. 271 neqîl dike: I. Beşikçi, Doğu Anadolu'nun Düzeni, Sosyoekonomik ve Et-nik Temeller II, Yurt Kitap-Yayın, Ankara, 1992, r. 454.

(2) Binere: Sosyalizm ve toplumsal Mücadeleler Ansiklopedisi, Weşanên İletişim, cild 7, r. 2116.

(3) Ji bo vê bahsî binere: İsmail Beşikçi, berhemâ navê wê derbasdibe (b.n.d), r. 544- 553. Sosyalizm ve toplumsal Mücadeleler Ansiklopedisi, Weşanên İletişim, cild 7, r. 2116.

(4) Li Hevpeyîna bi Av. Şerafettin Elçi re binere: Rafet Ballı, Kürt Dosyası, weşanên Cern, Stenbol, tebâxa 1991, çapa dudan, r. 601-602.

Ji bo vê basê binere: Li nameya İbrahim Küren: Muhsin Kızılıkaya- Halil Nebiler, Dünden Yarına KÜRTLER, Yurt Yayınları, Stenbol, 1991, r. 150.

PENCERE

Bê massmedia nikarîbûn

PETER NILSON

Isal beriya ku sêv bigehîjin hechecik wenda bûn. Ku mirov guh li gotinê pêşyan bide ev nîşana zivistanekê dirêj û dijwar e. Dema roj berbi tarîbûnê ve diçe êdî wexta xwendina pirtukan e.

Ji nişka ve çavê min bi pirtûkeke ku min cil sal berê ew nexwendibû ket, pirtûka novelê ya Anton Çexov; çrokeke ku laşê mirovan diricifne û nuha jî ji dema Çexov aktueltrir e.

Navê çîrokê "Şert" e. Ev li ser awûkatekî ciwan e ku bi mirovekî dewlemed re şert digire ku ger pişî razana hepsê, du miljon Rûbelîyan bidinê ew dê bi dilşadî panzdeh salan di hepsê de razê.

Yek ji mercen wî jî, çiqas şerab, xwarin û pirtûkan bixwaze dê jê re peyda bikin. Awûkâtê me dikeve hepsê, û sal derbas dabin .

Girtiyê me ji sala pêncan di hepsê de dest bi vexwarina şerabê dike. Ji sala şesan jî dest bi xwendina pirtûkan dike û salên dawîyê jî bêhîsab pirtûkan dixwîne. Wê demê xuya dike ku pirtûk xwendin ji şerabvexawrinê bi xetertir e.

Pişî mayina panzdeh salan di hepisê de, êdî ew azadiyê piçûk dibîne, çiku tiştê ku jiyanê bixwaze pirtûkê dayê.

Ew di hucra xwe de li her deverê geriyaye. Her dewletên dunyayê dîtîye, hilkişaye ser çiyan û ji jînên bedew hez kiriye. Ew xweşî reşiyê dunyayê dîtîye, imparatoriyêne mezin hilweşandiye, bajar şewitandine û mirov kuştine.

Tu mirovekî azad, bi qasî ku wî xwendîye tiştan nejiyaye û dê nikaribe bişî jî. Wextê ku hertişt di pirtûkan de hebe, dê mirov ji bo çi xwe bi realita rojane ve mijûl bike?

Ev çîrok bêaramîyekê di mirovan de çê dike. Her kesê ku dixwîne rastîya wê baş dizane; hîsîn ku mirov di pirtûkan de dijî di realîte de nayê serê mirovan.

Di wexta Çexov de ne film, ne video û ne ji internet hebûn. Nuha reqîbê pirtûkan derketine. Em her deverên dunyayê di TV de dibînin û bi "Starship Enterprise" ve dikarin di nav stêrkan de bigerin.

Ji ber ku hinekan ev resim ji bo me amade kirine, em wan bê ku fantaziye xwe bikar bînin, dibînin . Bê guman rûniştina pasîv a li ber TV'ê ji xwendina pirtûkan rehettir e.

Girtiyê me Çexov, bi xwendina pirtûkan ve li ber xwe dide, lê ka em ci dikan?

Em di nav resmîn ku ji her aliye dunyayê tê de, dixeniqin. Dewlemendiya elektronîkê rê dide ku em ji her xweşî û xerabiyê dunyayê para xwe bigrin, heta girtiyekî muebed jî dikare di wext û gerdûnê de geştekê bike.

Nivîskarên 'science fikton' Artur C Clarke û Ray Bradbury li ser van tiştan, di salên 1940'an de nivîsandine.

Dikare wextek were ku hewcedariya me ji rastiya jiyanê re nebe, lê emê dîsan jî bikarîbin her tişî bijîn. Em êdî dîbin wekî girtiyê Çexov. Ji me ra massmedia divê, bê wê jiyan ne jiyan e.

Dawiyê girtiyê me du milyon rubleyan naxwaze. Ew têdîgihîje ku jiyan xeyal e û bêmane ye. Ne iştîyacîya wî ji peran re heye û ne jî qîmetâ jiyanê heye.

Ev zîrektiya Çexov nîşan dide ku dawîya kesenê ku pirtûk xwendine û xerab bikartînîn çawa ye.

Ez meraq dikim ku ger Çexov bijîya dê li ser massmediaya îroyîn û yên ku wan xerab bi kar tînîn ci bigota.

Nivîs ji "Metro" ya 12.09.1996'an hatiye wergerandin.

Wergerandina ji Swêdî: Wehab Bilgeç

DANASINA PIRTÜKAN

amadekar: EMİN NAROZİ

YEDIDUT (News & League Information=Nû-çe & Agahdariyên Civakî)

Ev kovareke nû ye ku vê beharê li Îsraîl dest bi weşanê kiriye. Kovar ji aliye hinek Kurdên Îsraîl ve bi İngilîzî tê weşandin ku bi navê "The Israeli Kurdish Friendship League" (Komeleya Dostanî ya Îsraîliyan û Kurdan) komeleyek ava kirine. Li gor agahdariyên ku di kovarê de ne ev komele û ya bi navê "The Kurdish Cultural Center" (Navenda Çanda Kurdi) di dawiya sala 1993'yan de bi mebesta danîna pêwendîyan di navbera xebatê kultûri û zanistî ên Kurdan de, bi hev re li Îsraîl hatîne damezrandin. Herweha geşkirin û xweşkirina têkiliyên civakî û çandî yên navbera Kurden Cuhû, Misilman ci Sunnî û ci Şî'i, Ezidî û yên din de jî armanceke girîng ya vê komele û navendê ye. Dê komele li ser ziman, dîrok, çand û folklorâ Kurdî ji bi riya damezrandina instutiyêne lêkolînî, projeyê legerîne amade bi ke û ji bo vê yekê civîn û semîneran çêbîke.

Kovar ji heşt rûpelan pêk hatye û tê de li ser rewaşa Kurdan bi gişî û li ser ya Kurdên Îsraîl jî bi taybetî gellek agahdariyên nû û hêja hene. Herweha tê dc li ser pêwendîyan dewleta

YEDIDUT (News & League Information)

YEDIDUT

(News & League Information)

İsrail Kurdish Friendship League

20 Alexander St. Jerusalem,

İsrail 93-268

Tirk û ya îsraîl jî tê sekinandin, ji bo van têkiliyan bi awayekî siyâsi rexne li dewleta îsraîl têne girtin û bala wê bi ser gelşâ kurd ve tê kişandin . Di kovaře de tadeyi, qirkirin û zordes-tiyen ku li gelê Kurd dîbin bi yên cuhûyan ên kevn re têni qiyas kirin.

Hinek babeten ku kovar li ser wan radiwete ev in:

Di bûyera bombakirina otobusê li Qudsê de Kurd jî hatin kuştin.

Ji Îsraîl alikarî gihişte Kurdên koçbarbûyi Têkiliyên Îsraîl bi Ketina Turkiyeyê ya Bakurê Iraqê re (Moti Zaken)

Kurd û Politika (Matthew Hand)

Pirs ji serokwezirê Îsraîl li ser êrişa Bakayê

Rêwîtiya (Geştêkî) Dûr û Dirêj

Ev pirtûkeke zarûkan e ku ji Swêdî bo zimanê Kurdî hatiye wergerandin û îsal (1996) di nav weşanê Apec de li İtalyayê hatiye çap kîrin. Navê pirtûkê yê orjinal "Den Långa, Långa Resan" e, ew bi du zaravayê Kurdî (Kurmanciya xwarî û ya jorî) hatiye amade kirin û bi gellek wêneyen spehî ji hatiye xemilandin. Wer-gêre Kurmanciya jêrî (Soranî) Xebad Aref e û yê Kurmanciya jorî jî Alî Çiftçi ye.

Kîtêb bi gişî li ser bûyereke ku di dema cenga cihanê ya duyemîn de qewimiye, ye lê bi taybetî jî li ser serpêhatiya keçikekê û kûçikê wê rawestiyaye. Nivîserê pirtûkê Rose Lagerkrantz e û wênekeşê wê jî İlön Wikland e ku herweha ew navê lehenga serpêhatiyê ye jî.

Çendî di hin cihan de di nav herdu zaravayan de hinek cudaliyên piçûk derkevin jî lê rûbarkirina herdu zaravayan nirkê berhemê hê bilinditir dike. Di Wergera Kurmanciya jorî de peyva "bapîr" bala min kişand ku xuyaye bi şaşî ji bo "dapîr" yan jî "pîrikê" hatiye bikar anîn. Dibe ku ew li gor devoka herêmekê be jî lê hema ci bigir li herdeverî peyva "bapîr" ji bo "bavê bav" tê bikar anîn û nêr e, ne mî ye.

Rêwîtiya Dûr û Dirêj

WOW: KON HANDEL

NAMHAR: ROSE LAGERKRANTZ

Rêwîtiya Dûr û Dirêj

ROSE LAGERKRANTZ

APEC

Pirr mixab in ku di pirtûkê de li ser nivîserê wê tu agahdarî nayê dayîn.

Rose Lagerkrantz di sala 1947'an de li Stockholmê ji diyeke Macarî û bavekî Almanî hatiye dinê û li wir mezin bûye. Wê ji zimanê dê û bavê xwe bêhtir ji yê Swêdî hizkiriye û berhemên xwe pê dane. Piraniya berhemên wê li ser cuwan û zarûkan e.

Hinek ji berhemên wê ev in: Breven Frân Taggen (Nameyên Taggen), Breven Frân Frida (Nameyên Frida), När Den Röda Fågeln Sjunger (Demâ Ew Çivika Sor Dike Çîkeçik), Sång för Ensam Fe (Strana ji bo Periya bi Tenê).

Raperîna Çanda Kurdi di Kovara Hawarê de

Nivîserê vê berhemê Husen Hebes di sala 1982'yan de cara pêşî ji bo doktoreya filozofiyê li Moskowayê ew bi zimanê Rûsi amade kiriye. Pişî 12 salan îsal (1996) jî ew bi Kurdi Ji aliye weşanxaneya Hogir ve li Bonê hatiye weşandin û gîhiştiye desten xwendevanê Kurdi.

Kitêb bi xwe çawa ku ji navê wê jî tê zanîn, lêkolinek e li ser gencîneya kovara Hawarê û têdeyihîye wê bes bi bes li gor xwe şirove dike. Berhem ji sê beşen sereke, pêsgotin û paşgotinekê pêk hatiye û di paşıya kitêbê de jî navê tê de hatine rêzkirin.

Di beşâ pêşî de bi taybetî li ser Hawarê û bi gelemperi jî li ser rojnamegeriya Kurdi hatiye rawestandin û hinek agahdarî li ser rewşa Kurdan hatine dayin. Beşâ duyemîn jî li ser xebatê Hawarê yên sereke mîna çand, dîrok, ziman, dîn û civaka Kurdi radiweste û rewşa wan radixe ber çavê Xwendevanen. Beşâ sêyemîn jî li

Raperîna Çanda Kurdi di Kovara Hawarê de

HUSEN HEBES

RAPERİNA ÇANDA KURDI

HUSEN HEBES

BELEGHA HOGIR

ser rewşa edebiyata Kurdi ya Hawarê ye û ji bilî wê jî hinek agahîn taybetî li ser hîmdarê wê Mîr Celadet Bedirxan tê de hene.

Berhem wek naverok agahdariyên rind û hêja di xwe de digire lê xweziya ne ji zimanê wê buya ku bi rastî qet ne herek e û mirov gelleki diwestîne.

Husen Hebes di sala 1948'an de li Helebê çêbûye û li wir mezin bûye. Wî di sala 1982'yan de li Moskowayê rojnamevanî qedandiye û di sala 1984'an de jî bi penaberî hatiye li Almanayê cih war bûye.

Çiroka Xelata Nobêl

Beria ïsal bi sed salı, li gor tembinameya zaneyarê siwêdî A. Nobêl a berî mirinê, ramana xelata Nobêl û merc û mebest û bingehêne wê, ji dayikbûne.

Bi vê helkeftinê, gerek ïsal (1996) hem li Siwêdê û hem jî li Norwêjê şahî û ahengine navnetewi bêne li darxistin.

Béguman A. Nobêl, wek niviskarekî siwêdî, di çarçewa cihana zanistî û çandî ya sedsala 19'an de û di warê parasatin û bergiriya nirxên payedar ên mirovane de, û di hişê diroka aferandina navnetewi de, mirovekî hilbijarte ye.

Li Stokholmê di sala 1833 an de ji dayik dibe. Di neh saliya xwe de berbi Rûsyayê de hevrêtiya dayik û bavê xwe dike û bi awakî balkêş hînî zimanê rûsî dibe.

Piştî vê qonaxê berê xwe dide Ewru-payê, li Almanyayê û li Firansayê û li Ingilstanê xwendina xwe berdewam dike. Di warê ziman û fîzîk û kîmyayê de, her wisa di warê bijîşkiyê de jî zanîn û hismendiyâ wî kûrtir û berfirehtir dîbin.

A. Nobêl di zaroktiya xwe de ji xwendinê têr nedibû. Di ciwaniya xwe de dest bi nivîsandina helbestan kiriye û ji xwendina romanê klasikî hez kiriye. Di nameyên Nobêl de, bandora wan berhemên wîjeyî yê ku bîrûbawerîyêñ gitânbûha di hişê wî de damezirandine, û hestêni mirovane yêñ nirxdar û bêmînak di giyanê wî de çandine, xweş têñ xuyarıñkirin.

Piştî ku Nobêl wek zanyarekî hat nas-kirin, xwestiye ku di vî warê zanistî de çend aferandin û dahênanan pêkbîne. Piştî çend lêkolînên zanistî karîbûye di diroka sînâ de bi çêkirina (T. N. T) yê şoreşkî durust bike. Vê aferandinê bix-we re li ber çêkirina hemî alavê sefer û ragihandinê vekiriye, lêbelê Nobêl aştixwaz û mirovhez, aliyê dî yê aferandina xwe, ku jî bo mirina mirovan û ji bo çêkirina çekan û bi pêşvebirina teknika qirkirin û wêranê hetiye bi karanîn, bi çavêr serê xwe didit. Vê yekê renckêşan û derdêni wî yêñ giyanî û psikoloji duqat dikirin û nexwesiyêñ lêş ên ku ji ciwanîya xwe de ji wan digazinî û ji ber wan

derbasî nexwesxaneyan dibû, dijwartik dibûn.

Nobêl, piştî vê qonaxê, dest bi alîkariya hemî kesen ku ji bo aştiyê dixebeitin, dike. Zemîna aborî bo hevala jiyana xwe û aştixwaza navnetewi (Sotnar) ji bo pêkanîna çend kongreyen navnetewi li Romayê û Bérne û Viyanayê, amade dike.

Wexta ku Nobêl hest kir ku edî mirina wî nêzik dibe di sala 1889 an de dest bi nivîsandina tembinameya xwe ya pêşin, kir û di sala 1893 an ji nû ve ew tembiname nivîsand hetanî ku di sala 1895 an de forma wê ya dawîn pêkanî û alîkarê xwe R. Solman dike berpirsê pêkanîna naveroka wê.

Di sala 1896 an de, di 10 ê Decemberê de A. Nobêl serê xwe datîne û samaneke aborî ya pir mezin (Di wê wextê de bi qasî 33, 2 milyonê Sêwêdî ye) li dû xwe dihêle. Di tembinameya xwe de Xestiye ku sîdwergirtina ji vê samanê li ser pênc xelatêni ku wî bi xwe hilbijartibûn, bê belavkirin. Digel tevliheviya ku ji alî malbata Nobêl li ser naveroka tembinameyê û li dijrawestana wan jî û di gel hemî guftûgoyen ku li ser tembinameyê hatibûn kîrin jî, di dawîya dawî de bîryara rîzgirtina daxwaz û arezûyê Nobêl bi serket û dezgehek bo parastina samana wî hat avakirin û R. Solman bixwe jî di sala 1900 û de wek birêvebirê wê dezgehek hat hilbijartin. Di wesi-yetnameya xwe de, A. Nobêl babetê xelatwergirtinê yêñ zanistî û wêjeyî dest-nîsan dike.

Di hilbijartina babetan de Nobêl babetê ku kîfa wî ji wan re dihat û bi wan mijûl dibû di wan dixebeitî wek fizik, kîmya, bijîşk, aştî û wêje, destnîsan kirine. Nobêl, li gor bîr û bawerîyê xwe, li gorî prensibîn kubergîrî û parastina wan dikir; merc û awayen pêşkêski-rina xelatan şîrove dike. Li gor ku nivîsandîye, gerek wergirê xelatê mirovîne idîal û hilbijarte bin; ji bo xweşkirin û xweşkirina jiyanê û mirovatiyê xebat-karêni bêhempa bin. Gerek li ser nasname û hemwelatiya wan kesan jî ti carî dudîlî û rawestan çenebe.

Di vî warî de, Nobêl bi xwe xwestiye ku zanîyarên peymangeha Karoliskayê ya Stokholmê xawen mafê dayîna xelatê fizik û kîmyayê be. Û Akademiya Swêdê ji wergirê xelata wêjeyê destnîsan bike; her wisa ya aştiyê jî ji alî Parlamenta Norwecê ve bête pêşkêş kîrin.

Tiştîn ku li tembiya Nobêl hatine zêdekirin ew in ku roja mirina Nobêl (10'ê December) wek roja pêşkêski-rin xelatê bi cîhkîrin û guhertineke balkêş di warê babetê xelatê de, di sala 1968'an de ji alî Banka Navvendi ya Swêdî hatîye çêkirin ku bankê bi xwe xelateke ditir bi navê Xelata Aborî damezirandiye û mafê wê xelatê girtiye ser xwe.



Alfred Nobel

Xelata Nobêl

Gava helbestvana Polonî Vislawa Szymborska nûçeya perûkirina bi xelata Nobêl ya edebiyatê girt mina her wêjavanî béguman ew jî pîr dilxweş û şad bûye, lê bi vê re dibe ku di dilê wê de weha jî şewirîbe: "Çavên felekê birrijin gelo çîma ev xelat 15-20 sal berê, hê ku ez li ser heng û benga xwe bûm nehat". Ew bi bîhistina nûçeya xelatê re li hev şaş bûye, heyri maye û tîrsiyaye jî ku dê xelat bibe sedemê xerakirina huzûr û jîdestderxistina azadiya jiyana wê. Dibe ku matbûna wê ji ber derengmayina berê vê xelata giran-bîha be jî, çiku di civaka Polonî de ku pirranya temenê jinan 75 sal in, 73 sal emrekî mezin e ku edî piyekî mirov diçe hafa gorê û yek dîmîne.

Ji xwe dema min ew di nav koma medyagêran de dît ku destê wê li ber eniya wê bû û nema karibû bersiva wan bida, min bê hemdê xwe got: "Xwedê goş dide mirovê bê diran". Lewra ger ku ew xelat di ciwaniya wê de, hê ku li ser kemîna xwe bû bigîhfîstayê dê jiyanê xweş pê derbas bikirina û béguman wê karibûna berhemên hê çêtir jî bidana.

Di bersiva telefona rojnamevanê Da-gens Nyheterê de ew weha dibêje: "ez li ber mirinê me, ez bi zor bi çaplûka hatim ser telefonê, edî lingê min neima bi min re têñ, min iro 50 hevpeyîn dane". —Kengê hûn li ser wergirtina xelatê agahdar bûn?

— Iro seet li dora 12'yan, ya rastî ne ez li bendê bûm û ne jî jê re amade bûm.

— Reaksiyona we ya pêşî çibû?

— Hissîn têkel, dilşadiyek pîr, şaş-mayîn û herweha tîrs û bêhîteke mezin. Béguman xelata Nobêl berpirsiyariye-ke giran bi xwe re tîne, ew erkeke mezin milê mirov ku mirov eşkere dibe û dibe malê giştî, ev yek jî ji min re zahf zehmet e.



Wisława Szymborska

Vislawa Szymborska kî ye?

Helbestvana perûkirî Vislawa Szymborska 73 salî ye û li Polonyayê li bajare Karakow rûdinê. Heya niha 16 berhemên wê yên helbestan hatine weşandin û li welatê xwe pîr tê hezkirin. Ji wan berhemên wê bi tenê du cild: "Qet ne du caran" di sala 1982'yan de û "Utopia" di sala 1989'an de bo Swêdî hatine wergerandin û çap bûne.

Li gor nîvîserê Polonî Ryszard Kapuscinski "Ew cergübza terwende, ew dilsoza mirovîz, gerdûnî, rengsayî, sade, nefspiçûk û rexnegira bi tinazên milahîmî hatîye perû kirin. Ev tiştîn han giş helbesta Vislawa Szymborska dîkin bijareya baştîr û herweha bi awayekî hê-sayî amade jî bo gellekan. Ji xwe di vê dema me ya bi xeter de béguman edebiyateke wusa pêwîst e".

Ji 1901'ê û vir ve 84 mîr û 9 jîn bi xelata Nobelê ya edebiyatê hatine perû kirin. Xelatwergirê jîn ev in:

Selma Lagerlöf (1909, Swêdî)

Grazia Deledda (1926, İtaly)

Sigrid Undset (1928, Norwejî)

Pearl Buck (1938, Amerikayî)

Gabriela Mistral (1945, Şileyi)

Nelly Sachs (1966, Swêdî) digel Shmu-el

Yagnon

Nadine Gordimer (1991, ji Afrika Başûr)

Toni Morrison (1993, Amerikayî)

Vislawa Szymborska (1996, Polonî)

Ev çend rîzên jîrîn hînek ji helbesteke xelatwergira 1996'an Vislawa Szymborska ku di 2'ye Hezîrana sala 1923'yan de hatîye dinê, ne:

Canbaz

Ji xelekên hêlekanê (trapetsê) ta ta xilpoqên hêlekanê (trapetsê) di vê [bêhisiya zû]

bêdengiya piştî daholê de, çepraft çepraft di nav wî bayê şâşbûyî de, ji ji giraniya laş bi leztir, na ne niha niha jî negîhîst ku bikeve.

Tenha ji tenhatiyê jî kêmîtir, kêmîtir, çiku ew seqet e, ji kêmîbaskî kêmasiyeke perr û baskan diêse, kêmasiyeke ku wî bêgav dike ku şermî [kar] û bêperwaz bifire, erê iclaf tazî û şiyar.

Deftera hizran

ADONIS

Wexta ku li ser xwe dipeyive dibêje:
Ez şerê dîlîtiyê dîkim.
Lê ew bixwe dîlê ramanê xwe dijî.



Ji bo ku tu ji xwe berbi xwe de biçî
Gerek tu di rîça yê dîtir e derbas bibî.



Eger azadî di cihana nûjen de bibûya la
[şek,
Dê ev laş teqneke birinê bi hevûdû ve
[dirûti bûya
û mina termekî dê bi sergerdanî li ser
ava çemekî ji xweînê
serav bûbaya.



Daku tu binivîsinî gerek tu bixwînî.
Lewra qedexekirina pirtûkê ne tenê
qedexekirina xwendinê ye lê ya nîvîsan-
dinê ye ji.
Qedexekirina pirtûkê wek qedexekirina
nen e:
Birçikirine.



Nîvîsandina bêxwendin nexweşî ye
û di çanda me de dest bi berfirehkîrinê
kiriye.
Nîvîskarêni li jêra xwendinê hene- Tişa
ku dixwînin tênağîhêjin,
û nîvîskarêni li jora xwendinê hene- pê-
diviya hişyarî û zanînê hest nakin.
Dîmenê herî kirêt ên vê nexweşîyê ji
[di ferman û
birûbaweriyan van herdû celeban de
[dixuyin.

Li gorî rewîsta me ya taybetî çiroka Ha-
bil û Qabil wîsa tê gotin:
Di destpêkê de, hişyarî ne ji bo mirov
bû lê ji bo qijalkê bû,
û di destpêkê de nîvîsandin nebû lê
kuştin hebû.



Li gorî ku rewîsta me ya siyasi dibêje:
Ne mirov dewletê çê dike lê dewlet mi-
rov çê dike.

Ü her li gorî wê gerdişeyê:
Mirov ne bi viyana xwe tawanbar e,
renge ji ber vê yekê ye ku revyayî ji da-
yik dibe û dîjî û dimire,
kêm zêde, bi vî awayî yan bi wî awayî,
zindanbûyi ye.



Li gorî ku çanda me dibêje:
(WELAT) ne bingeha yekem a jiyana me
ya hevbeş e.
Lê (Partî) û (Alîgirî) û (nasnameya siya
[sî] ye.

Her li gorî vê çandê:
Ziman realiteyê dernabire, lê ew bixwe
[realite ye.



Hin civatê(nûjen) hene ku ti tişt tê de
bi pêş de naçe
ji bilî (kevnaretiyê).



Ziman da ku hergav xwe li ba bike wek
[evînê ye.



Nîvîsandin maka ji dayikbûna guherî-
nê ye.



Beyî projeyeke ramanî ya nûjen proje-
yeke siyasi ya nûjen nayê damezirandin.
Ev herdû proje ji ti carî nayên pêkanîn
eger ne di çarçewa çandekê de be;
çandek e

ku bikaribe wîsa bibêje:
Mirov ne xweristeke bê guhertine,
îbelê bûnewerekî xwerist guhertokî
[ye,
û di xweristê de têt guhertinê.



1 A ku nimêja daran dike bager e.

2 Ku ne bi hêsrên esman be
zemîn xwe naşo,
Ev ji ne hezkirin e.

3 Da ku tu hilperikî çiyayê bêjeyan
Yan ji da ku tu di deryayê peyvan de
bin av bibî
Helbestan bixwîn.

4 Biranîn ku silav be ji
agir e.

5 Eger angoyek(maneyek) ji demê re he
[be
dê di ewran de peyda bibe.

6 Hetav ji bilî ronahiyê
ti karî nake.

7 Ma gelo, ji zarotiya min ve, ti karekî



ditir tunebû
ji bilî ku ez bi dû ewran de bibezi?

8 Ku ne di hebûna baranê de be
Dar nizane bigirî.

9 Di evînê de
şev zo ye..

Xêlê dîlberan şîn veda.
Dengê Bilûredispêrim, bêhînîşka
Donkişot im.
Rêvingiyê cinoyî me, li ser zarê Kafka
[simaq im
Min li vê bazarê bi tenê nehêle
Dilekî nehtorêfermîska tîrêşqê me
[dilber
Xurt im mîna kurmekî di bexçikên
[bêriyan de
ferhad im ev ro dilê şevê me
O... O... Hez dinal im wek bilbilê zar
Ey bêriyê! Tu bi fixanan hetiye
[xemilandin
Ez pîr im, li ber eşqê bêhêz im.


Ên serşehkirî bû.
Li ber (Xilmaşiyê elendê)
lehiyek ji kurtepistê, di dilê
[dilovanan de

Xirecirêñ xewne şeva

TENGEZARÊ MARÎNÎ

Kevîka kevinepêlava gunehbar,
Mîna we, şiyêñ mitalan lêvexumeha,
xwe hinart, daweşand.
Şev li min mukur hat,
Bêdav, av û gav,
Bêxetîr, bêbihar,
Şevîn bêser û şop hişt
Kenê ji qama çiyê, şilo nebû
Hêlinêk miştî Tembûr
Tûşî çiravêñ serşehkirî bû.
Li ber (Xilmaşiyêñ elendê)
lehiyek ji kurtepistê, di dilê dilovanan
[de
P...e...n...g...i...z...î!
Teka teka..

Firyad xwe ji te didin berdan
Kul li ser kulê konê xwe vedigire
pencen (Dugirê) tênim bîra xwe.
Çawa mîvanê pazdeh rojî yê
Tirbesipiyê ferfitand.. Weledoo!
Bi serê xwe, hêviya taristanekê bû.
Belê Tirbesipiyâ li ber çav,
Çerandina te ji bi şermezari li bêjingê
dikeve.
Hêdi hêdi..



Tinazêñ Şêxoyê Nado û zurneya Leto
firdikê mîst li dewsa xwe dihiştin.
Kolanan çançînkê ji awazê xwe vala
[kirin.
Spêdê lîlandina xwe tiraş dikir.

Şemlo ez çî din bêjim?
Bayekî bênişkî,
Hevîrtîşê serberdanê, li qonaxêñ
horiya sündêñ xwe dax da.
Morîkeke şîn im.
Dergûşa dudiliyê me, bêdezegeh im
Ji eşqêr e şev im
Li ber kemendêñ bêrikirinê eşq im
Cana min eşq im
Di paşila Girîstanê de,
qirkirina awazêñ qereciya me, lawaz
[im
Ji bedena rewrewkê,
Heyberê bênasname.. Hildibim
Li xewnêñ (Hespê Sipî) xir dimînim
(Royar) o
Qiraxêñ...
(Sîrûdêñ Rono) vehisînstanek e,
seqakirî ye Ehmed o
Bi hisretî sergorna me, bi hemî
mîneşîna Tirbesipiyê nadim
Neşîna li ber Ehmedê mala Mûsê,
şikestinêñ min in.
Orfiyos Paganîni bêminet dike.
(Adagio) li ber şîretîn mirinê dinimehe
Tevna pîrepindê sedema bêxefatan
[didoşê.
Hevîrtîşê çi kakîlî ye, rebeno!
Temenê me diqurmiçe yerêbûn.

(Ji êş û ji bajêr tênim tênim) simên:

Hannover
10/07/1996

Xeter di razana nav livinan de ye

MARK TWAIN

Bilîtbirrê şibakeya bilêtan got:

— Tu sîgortaya geşte ji dixwazî?

— Na Spas, piştî ku ez bi qandî niqûna çavan li ser fikirîm, min bersiv da. Na, ez ne bawer im. Ez ê iro hemî bi trêne bigerim, bes sibê ez nagerim. Ka ji bo sibê ye kî [sîgortayekê] bide min.

Mêrik ecêbmâyî ma û got:

— Lê ev sîgorta ya tifaqê ye, ger ku hûn bi trêne herin...

— Ger ez bi trêne herim pêwîstiya min pê nîne, lê ku ez li mal di nav livina xwe de bimînim ez hingê ditirsim.

Bi rastî ez li ser vi babetî xebitîme û min rind hisab kiriye. Par ez békemâsi sîhezar kilometre bi trêne geriyam, pêrâr ez zêdeyî çilhezar kilometreyî bi keşti û trêne geriyam û betirpêrâr jî dîsa ez nêzî panzdehezar kilometreyî bi trêne çûm. Ger ez çend gerrêvir û wir ên nêzik ji têxiim hisabê ez dikarim bîbêjîm ku di van hersê salên çûyî de ez nothezar kilometre geriyame û tu tifaq jî neqewimîne.

Demeke dirêjî hersibe min ji xwe re di got: "Vê carê jî ez filitîm û şensê min ê pê re gîhiştinê zahftir bû. Ez ê hişê xwe bidim serê xwe û sîgorta xwe ya gerrê çebikim. Wek "amîna" piştî du'ayan min şikrima xwe anî ku bê şikestina lûleyeke heştiyê xwe û bê jiciderketina wê vê êvarê jî ez gîhiştim nav ciya. Piştîre ez ji van xem û kederêne rojane tev westiyam û min têra mehekê polîçeyen sîgorta yên rîwingiyê jî xwe re kirîn. Min ji xwe re got: "Ma xwe ne mirov sî çitikê (piyangoyê) vale bi hev re nakire".

Lê min şaş hisab kir; tucarî yekî ku qezencek jê kiribe derneket. Herroj min li ser qezayen trêne dixwend, rüpelîn rojnameyan bi tifaqen wan [trênan] tije bûn, lê jî ber sedemekî rengsir (esrarengiz) tucarî ew qeza nehate serê min. Davî ez lê hay bûm ku min gellek dirav xistine beşa sîgortayê lê min qet tiştekî jê bi paş ve negirtiye. Hay û gumanênen min ketin dorê û min dest pê kir ez li pey yekî ku di vê çitikê de qezencekê kiribe geriyam. Ez rastî gellek kesen ku diravan xistibûnê hatim lê min yekî ku tifaqek hatî-

be serê wî yan jî qirûsek jê karkiribe nedît. Pişî vê yekê min dev ji kirîna polîçeyen sîgortayê berda û dest bi hisaban kir. Encameke kesnedî derkete holê; xeter ne di gerrê de bû lê di sekna li malê de bû.

Ez li agahdariyên statistikî qenc geriyam û bi awayekî şaşmayî min dît ku digel ewqas şemate û sernivîsên rojnameyan ên li ser tifaq û teşqeleyen trênan bi rastî miriyen wan felaketan ji sêsed kesî hindiktir bûn. Xeta Eriye [xeteke trêne ye li Amerîka] ku ji nav wan ya herî ku jek bû, cil û şes yan jî bist û şes kes kuştibûn. Qenc nayê bîra min lê ez dizanîm ku hejmara kuştiyên wê ducarî yên din bûn. Bes zû hate zanîn ku xeta Eriyeyê ya herî dirêj bû û di welat de xeta herî rîwingîbir bû, ji ber vê yekê jî hejmara kuştiyên wê zêde ecêb nînbû. Dawiya lê kolînê ramî da ku xeta Eriyeyê rojê heşt caran di navbera heryek ji New York û Roçesterê (Rochester) de ku li ser hev 16 car û birin û anîna 6000 rîwiyi dike, diçe û tê. Ev di şes mehan de dibe nêzî mîyonekî, bi qandî xelkê New Yorkê. Yarıf di xeta Eriyeyê de di şes mehan de ji mîyonek rîwiyi wê ji sêzde heyânî bîst û sê kesan têne kuştin, lê di eynî demê de sîzdehezar ji xelkê New Yorkê di nav cihen xwe de dimirin. Bi vê serencamî re bayekî cimidî li mazmazka pişta min xist û mûyê serê min çik repp bûn. "Ev pirr bîhêt e" min ji xwe re got, "xeter ne di gerîa bi trêne de ye lê belkî di xwesipartina nav van cihen mirovkuj de ye. Ez tucarî di nav livinan de hew radîmî".

Jî dirêjiya xeta Eriyeyê min ji nîvî pirr hindiktir hisab kiriye, çimkî baş diyar e ku tevahîya xetê yanzde- donzdehezar rîwiyi dike û tîne. Gellek xetê kintir ên ji Bostonê radibin hene ku bi rihef nîvewqasî dîbin û tûnin. Pirr xetê rîwîzahf hene ku li temamê Dewleten Yekbûyi belav bûne û rojê birina 2500 rîwingiyî di zik hev de di her eyaletekê deji wan re ne zahf e. Di welatê me de 846 riyên hesin hene û 846 car 2500 dike 2 150 000. Riyên hesin yên Amerîka rojê du mîyon mirov, salê şesşed û pêncî mîyon ji bîlî yekşeman dîbin û tînin û ev



bêşik û eseyî ye. Lê ew vi materyalê xam ji ku tînin ew dervayî zanîna min a matematikî ye, çiku ez çend caran li hejmara nîfusa welêt geriyam bes min lê nîhîr ku ewqas kes di Dewleten Yekbûyi de tînin. Dibe ku eynî mirov car bi car têne bîkanîn.

Xelkê San Firansisko (Francisco) **X**eştyeka yê New Yorkê ne. Di bajare kevn de heftiyê 60 bûyerê mirinê çedîbin û ku bext lê bîne di yê dawî de jî 500 kes dimirin. Ev salê dibe 3120 bûyerên mirinê li San Fransisko û heşt car li New Yorkê ku dibe 25-26000. Rewşa laşaxiyê li herdu cihan eynî ye, ji ber vê yekê ye ku mirov nikare eynî pîvanê ji bo temamê welat bikar bîne û li wê gorê bêje salê serê mîyonê 25000 kes ku dike çardeyeke temamê nîfusa me [Amerîka], dimirin.

Yanî salê mîyonek ji me dimirin; ji vê mîyonê deh- dozddehezar bi kîr, bi çek, bi xeniqandinê, bi daleqandinê, bi jehrê, yan jî bi awayekî ji yê zorê yên sernas (popüler), mîna bi teqandina lambeyêndon (gazê), şewatêñ binkirasen kevn ên gerrîwan û naylon, yan di kanen (madenî) rejiyê de, têne kuştin. Tevî wanen ku ji ser xanî dikevin, yan jî eywanen dêr û dibistanan terayî erdê dîbin, yan jî bi derman û awayekî din xwe dikujin. Di xeta Eriye de ji 23 heya 46 kesan têne

kuştin, û di heryek ji 845 xetê din de sîyeka wan kuştin çedîbe. Yen din ji vê mîyonê ku hejmareke bihêt, mîna nehsed û heştêhezar û şesşed û sih û yek cendekî dîkin, di livînên xwe de bi mirineke normal dimirin.

Hûn min bibexşînin ku ez xwe nadim ber xetera van livinan, xetê trêne ji bo min bes û zahf in jî. Şireta min li herkesi ew e ku zêdeyî pêwîstiye di mala xwe de nesekinin û ger hûn bêgav bûn û çendeyekî li mal rawestiyan jî hingê demetek kaxizên sîgortayê bikirin û bi şev şiyar bîmîn. Ji xwe mirov nikare timî baş haydar be. (Niha mirov tê digihîje bê çima min bersîva bilîtbirri wusa da heya ku bû sedemê destpêka vê meseleyê).

Dersa ku mirov ji vi perçeyê piçûk derîne ew e ku mirovên bêfêm pirr gîlî û gazinan ji idareya xeta trêne a Dewleten Yekbûyi dîkin. Gava em li çardehezar trênen cuda dinêrin ku barkiriyê ji can in, bi mirinê dorpêçayî ne û salewext bi şev û bi roj di nav welêt de dicin û tê; ne ecêb e ku di salê de sêsed mirovî diku-jin lê ya balkêş ew e ku sêsed carî sêsed kesî nakujin.

Yê ku ji Swêdî wergerandiye:
EMÎN NAROZÎ

RİNDÊ ÇÂCAN

Bedena kerr

Bêrikirineke xav û bêdeng
bîranînen min bi bajarekî windayî
rengîn dike.
Kolaneyen tazi
tenê bi girî
qêrîna bedena min ya kerr
êxsîr dike.



Xemla pehîzê

Tiliyên rengîn
gunehkariya salan civandin
kavîlên wê kom kirin
û hîn jî tu xewn i.
Qêrînek bi rê ket
rê dûr bû
bar bêhîncikiyayî bû
û bendewarî diyarî bû
ji keçekê re ku pehîz xemila wê bû.

Kewname -I-



EHMED HUSEYNI

Li ber dergehê vî çiyayê xewn ve çiryayî, tu hes-pêñ westyayî yên dîrokê hînî verêşanê dikî. Tu bi hikulên xwe yên kevnare û birîndar; rêzên darbestan şanî bagerê dikî. Di himbêza xelmaşbûna te de, nav têñ ji bîr kirin, soz û peyman, bejna stiranê; kulîkîn ku xwe ji te re dixemilînîn, têñ kuştin.

Erê Kew o!

Tu li ber lingan diçî. Şarêñ te, hêlînêñ te, pencere û qebqebla te, deştêñ te, peyv û pirtûk û xewn û helbest û sirûdêñ te; di xwîna nûriyayî de digevizin.

Dilê te; dilê ku ji ber êrişan û qirkirinan, xwe bi harmoniya jena xwe paye dikir, dilê ku di sîngâ çiyê de xetîreya rastiyê gur dikir û xewna sêwimayî, ji seqema dîrokê diparast û li ber tîna tembiyê nîvco yên şehîdan dîlorand, dilê te êdî çawan dê bibije poşmaniyê?

Erê Kew o!

Tu bi êlan ûolan, tu bi serok û serlesker û virokan, tu bi kînê û şînê, bi reşig-reşanê, bi bendêñ nemanê, bi asoyen gîryanê, bi ferhenga talanê, bi goristanan, bi diz û bazırganan, bi binemal û bi galgal û bi fort ûsloganen kal, hatiyî dîrpêçkirin.

Sînorêñ firîna te di axaftinê de beraveti dibin.

Sînorêñ qêrîna te di mirina pêşin de dîderizin û derya çavê te; derya xemgîniya sermedî, bi ser kenarêñ nifirê de dirije.

Ne xem e?! Hemî daxwazên te ji roja roj de serberdayî ne; di tengerêñ taristan û şewatê de, diqurmiçin. Hestiyêñ te, qaf û gavêñ tirsnak di nav mayinan de diçurisin, goşte te û zinarêñ tarî çirokan ji ber dikin, zifistana te di koçbariye de dihêwire. Dîwarêñ te dibawişkin û girêza te ya teze dihingive tovîn pêşeroja reş.

Pirsên te pirsine kirêt in, û li hawirdora te berazêñ sergerdan laşê te dinejinînin.

Ro wînda dibe, û baskêñ te di xirecira dijminatiyê de geh dişikin û geh bi dû termê xewnê de dikişin.

Erê Kew o! De mezin bib, de hîn bib, de [din bib!]

De rengê çavê xwe diyarî vê tinaziya [bêreng bib!]

Li hemî peyvan û li hemî heyvanêñ dîroka xwe bizîvir û serê xwe berbi kavi-

lan de bilind bik, da ku di wê gumanê de hemî guman bilerizin û hişê keviran bi mîrxasî di ser dev re biçe, da ku lîlandin zuha bibim, û şehîd poşman bibin, û bawerî talan bibin ûwelatperwerî lal bibin û çiya hew qal bi-bin.

Tu di navbera xwe û dijminan de radest dibî, milêñ te li ser zozanân digirian û lingêñ te di bêbextiya demê de ditevizin, û pişta te di palpişta gernamê de zix-têñ nasnameyê werdigirtin.

Li vir eniya berxwedanê sor e kew o!
Li vir çavkaniya berxwedanê reş e kew o!

Li vir serokê gulvedanê kor e Kew o!
Li vir qehremanê xwepêşandanê nexweş e Kew o!

Dêmek tu ji di navbera Kakan û Maman û Apan de, di navbera welatekî deh al û sed mal, di navbera rîba-zan û dilxwazan û canbazn û rimbaz û derewbazan de segêb bûyî!

Erê Kew o! Ma te çi ditiye?

Giregir ûrûsipyen te, di şingîna simbel badanê de, masiyêñ mirî, li ser sêla agirekî vemirî, dipêtin. Rik û qayışkêşan e, serwerêñ karwanan ji rewrewka tîşen laşê te, iro, li ser devê rîça hetava bêfîn, rolan li hevîdû-dabeş dikin û darbesta te li ber destê genibûna qederê, wisa, bênavnîşan û bêyad û sersom dihêlin.

Erê Kew o!

Baskêñ te esmanekî şîntir û berfirehtir dixwazin. çavê te asoyeki ciwantir û dilovantir dixwazin. Seqema giyanê te, agirekî pîroz û bêdengiya hêlinâ te piggierekî dilsoz, dixwaze.

Pirtûka te ya xemgûn û mişt girî, dîlokeke narîn dix-waze:

Tu hemî bager û bahozan ji nişkê ve himbêz dikî.

Tu bajarêñ dorpeçkirî di bi pênuşa dilê xwe rîz dikî.

Tu xweliya serê xwe bi ser jînbî û sêwiyan de direşî

[nî..]

Tu sibehêñ xwe ji nav lepêñ şevê digel terman de di

[kişinî..
Tu saz û sirûdêñ zuha di perdeyêñ tembûra xemgîn de
[dişikinî..
Tu xwedanê xwe bi ser lerza demsalan de diweşî
[nî..
Û tu xwîna xwe berbi rîçen sefera bê kutayî de dime
[şîni..]

Erê Kew o!

Ciyayêñ te, heyva te, peyva te ya bêkêr, bîhîv û bîra-nîn û derbend û pêlavêñ şevê, xwe dadane pêxera revê. Li ser pişta qantirêñ westyayî duryanan hildibijêrin, sînoran û bargehan di hişê mirinê de dihejmêrin.

Dimirim Kew o!

Bi ala qebqebla te têm rapêçan.

Ku çîren çavêñ te vedimirin tiliyêñ xwe dikeritînim.

Ku nîçirvanêñ te xwe di qermîçekêñ şevê de vedişerîn, berzûrî rondikêñ dayika xwe dibim.

Ku tîrsa te berbi kenarêñ goristanan ve diherike, hil-diperikim barana destê sibehê û li ser xaçê bîranan li esmanekî mit û mat temaşe dikim.

Erê Kew o!

Tu di zindana giyanê min de kevnare dibî û serê min li ser balgeha qebqebla te ya bêaso, ditevize, dişike, û tenhatiya tengê te, tenhatiya çiyan û seqema bêxwedî-mayî berbi penceriyêñ asêbûyî yên xewnê de, dikulkulin.

Tekcûn e, li ser çermê vê berbangê bi tîpine tekçûyi hatiye nivîsandin.

Karwan e, ji mirinê dest bi mirinê dike û di tenhatiya serdeman de li rîçen windabûna xwe digere.

Term in, bi alêñ sor û zer û kesk, bi serpêhatiyen xweliyê û bi ferhengen xap û derewan, rapêçayîne.

Şeva kor di gumana firîna te de bêxetîre ye kew o!

Şûn û biskêñ hawirdor, perdaxa jehrê li ber te ye

[kew o!

Wek kewê caran Kew o!

Wek xwîna erzan Kew o!

Wek nanê jarân Kew o!

Wek mirina daran Kew o!

Wek serê kurdan Kew o!

Wek gumana ziman kew o!

Wek.. Erê Kew o! Erê Kew o!

Di neqeba min û te, ava girikî, barana westanê, tavsorka hêviyêñ müşextbûyî, gür-zîn kelegirî yên xatirxwestina şehîd û xoşewîstan û belgeyêñ veçirayî yên dijminatiyâ serê sedsalan.

Min xwe dispart rûbarêñ zuha yên bêdeniya şevistanêñ te, min serê te li ser çoga lê-ewlebûnê datanî û min hemî sînoran talanê radikirin ser tapanan da ku pêşwaziya xewna te bikin. Tu di nav destêñ min de dixul-xulî, ferhenga lorandinê bi ser xemgîniya çavê te de dirijiya, pirtepira firînê gerdena te dagîr dikir û bilûra taristanê bi ser te de diçemîya:

Dê li kuçe û kolanan darbesta min bigerînin
Dê nîçirvanêñ naçar bîranînê kuşinî biçirî

[nin

Dê pêlîn şîniya rûyê te bi serhişkiya peravan

[rawestînîn

Dê li ber sîbera Akill çav reş biafirînin
Dê sitêrkîn ken û tovîn jiyanê li ser lîvîn te

[biçinîn

Dê govend ûstiran gêj bibin wexta ku pey

[manê ji te re bişinîn

Dê pêxwas ûkeleşen te, noker ûnexweşen

[te, bê nav bimînîn.

Dê (dijminê serê xwe ye) ji kewistana şîniya

[ciwan hilînîn

Berdewam dike!

Waya hewt birayûn

ARÊKERDOX: SEYIDXAN KURIJ

Cayk benû, cayk nibenû, yew dewi di yew ciniek û kênay xwi bena. Nûmê kêna Serfiraz a. Rojêk Serfiraz şina miun umbazûn xwi. Yi kiştê bununi di nişenî rue û neqîş virazenî. Kênenûn ra yew tîz verdena xwi, la çew nizûn kûm tîz verdawa xwi. yew vûna: sarê biray mi ser mi nikerda, a bîn vûna: sarê biray mi ser mi nikerda. Biray Serfiraz ciñî, ayay ra ya zi vûna: sarê guêlik ma yê çar ser, mi nikerda.

Serfiraz şina kîye may xwi ra persena vûna: dayê çira biray mi çinî? Yew çî benû herkes sarê biray xwi ser sund wûnen, la ez nieşkena sarê biray xwi ser sund biwinî.

Daykê ya yi vûna. Biray tu êstî. Biray tu hunî sêr yew koya, yew mixara dê. May Serfiraz una ya yi ri yew her herrin virazena û ti ra vûna: Ti inî hêr niş; wi tu benû birayûn tu het. Lakîn ti gerekâ qet mevacî ços. Eger tu va ços, wi ben herr.

Serfiraz nişena herê xwi şina. Ya xêliyek waxt şina, erdi di yew mura vînena. Ya sînîgi mura vînena wazena herî ra biyeru war û mura bigiru. Ini sened vatê may xwi xwi vîra kena; vûna ços, ços. Her ca di ita ben herr, ya uca di munena. Serfiraz mecbûr hêna têpiya gêrena a yena kîye.

Daykê ya yi vûna: kênay mi, mi tu ra nîva mevac ços. May ya yi una hêna ci ri yew koya, vêr yew buni di vindenu. Serfiraz şina zerrê bûn. Ya vînena ki zerrê bûnî di hot heb cil hê rakerdê. ya una kîye çînena we, her ca kena pak. Birayûn xwi ri nun pocena. Xunçê wêr kena raşt, kulsiyûn dûmarê xunçî nûna rue.

Ben şund, biray ya yi sêd ra yêni. Sînîgi yi kîye o qide pak vînenî, şas mûnenî. Yewbînûn ra persenê; la çew nieşkenû bersivî bidu. Yi kuêni mûn cilûn; Serfiraz ûna kîncûn yi ni derzena, pîne kena û be-na vêr berzin yi ni di nûna ruc.

Yew, di roj ina vêryenî. Biray binati xwi di qisê kênî; yi biray qij ra vûni: ti êr ma di miye sêd, ti kîye di ruenî û bipawi; dê inî çu.

Birawu qij kîye di xwi nimnenu. yew demê cuwapê xenda vînenu ki yewkêna amê, ê zerrê dûariye, her ca ker pak. Wi ca di êrziyenû qûel kînek tepişenû; vûni: ti kûma, ti cinda, pêriya, ti ita ci gêrena.

Serfiraz vûna: ez nîye cindanîye zi pêriya, ez waya şima ya.

Wi vûnu: ti waya ma ya se, ti qê xwi nimnena. Ti waya ma ya sare û çim ma

ya. Ma eşkêni ita piya bimûni.

Serfiraz o ca di birayûn xwi het mûnena. Yi her rûej şinî sêd, ya zi yini ri nûn pocena. Biray ya yi ti ra vûni: wa adir huna meşueru, wahar adir vêci.

Serfiraz û yew pisîng têna kîye di mûnenî. Rojêk Serfiraz şina lewê bun, murun kena pa. Pisîng xwusizê kena, ya yew dûna pisîng ri. Pisîng hêrs bena şina mîza xwi verdena adir a, adir kena huna. Pisîng adie kena huna û yew mura kena mûn adir. Mura mûn adiri di bêriqiena Serfiraz vûna dê adir ho vêşenu. Ya sêr bûn ra yena war, şina zerre; wazena ki ci wêr poju, uniyena ki adir su huna.

Serfiraz wurzena we gêrena adir. Ya şina, şina sêr yew koya raşt yew bûn yena. Ini bûnî di yew pîra merdim wer û hot kênê ya yi cuyenî. Serfiraz şina zerrê bûn. Kênenî senî çim gunenî Serfiraz êciyeb mûnenî; yi vûni: ti kam a, ti ci ya, ci kêsî ya, ti ita ci gêrena?

Ya vûna: Ez gêrena adir, mi ra adir lazim.

Yi vûni: May ma merdim wer a, eger amê to wena. may ma piskenûn adir ûmarenâ. ma inkê adir bidim tu, ya zûna.

Waya qij vûna: taway nibenû. Ma sêr her piskenî ra yew bine tira kên, ya ferq nikena.

Yi sêr piskenê adir ra pê meqesa binê birnenê, adir û yew çêng hebikûn dûnî Serfiraz, Serfiraz kuêna tîye şina. Ti ni-vûn piş ya yi dirato, ya riyera şina hebik piş ra rişenî erd. Şund diyen, pîra merdimwer yena kîye. Pîr kênûn xwi ra vûna: yew bîê mehemediyyûn, yew bîê merdimûn ha yena.

Kênenî ya yi vûni: dayê ti xelet a, insûn ita ci gêrenî.

Pîr şina teber dumarê buni di gêrena; ya ita hebikûn vînena. Pîr rieç hebikûn gena şina. ya şina, şina rieç resnena bûn Serfiraz. Serfiraz ber qefilnawo, pîr nieşkena şuer zerre. ya qêrena, vûna: Kênenî mi, mi ra ber akir, ez biêrî zerre. Serfiraz ber a nikena.

Pîr vûna: Ti ber a nikena, engîsta xwi vej, ez engîsta zu sipena. Serfiraz engîsta xwi qula ber ra vejena; pîr engîsta ya yi sipena û şina. Pîr mûsena ina tim û tim



yena engîsta Serfiraz sipena û şina. Demêk cuwapê Serfiraz xêliyek bena feqîr. Biray ya yi meraq kênî, ti ra vûni: wayê ti qê ina rûejib rûej têpiya şina. Serfiraz mesela birayûn xwi ra nivûna. Biray yê piyeser, binatê xwi di muşewire virazenî. Yi biray qij vûni: siba ti ita bipawi, dê inî çu.

Roja bîn birawo qij pê bûnî di xwi nimnenu. Tij bîna berz, siba benû weş, wi henda vînenû ki yew pîr amê vêr ber, vînda Serfiraz da, Serfiraz engîsta xwi qula ber ra vet teber; pîr engîsta ya yi si-pit û şî. Biraw qij ca di dûnû pîri ri pîr kişenû. Şund diyen ey birayê bûnî zî sêd ra yêni. Yi waya xwi ra persenî, vûni: wayê inî çu? Waya yin, ci amo ya yi sare birawûn xwi ra vûna. Hor biray şinê, hot he-me kênûn pîra merdimwer ûnî û xwi ri mate kênî.

A roja pê hot heme kênê pîr û Serfiraz owca di piya cûyênî. Vêv guemimê xwi ra hes nêkenê. Hot way binatê xwi di mişewire kênî ki yew ci byarê Serfiraz sare û ya yi binate ra wedarê. Rojêk yi astuwar xwi veradûnî, astuwar remenû şinû. Yi Serfiraz ra vûni: astuwar rema şî, ti gerekâ şuer yi tepiş bîar.

Serfiraz astuwar dima şina. Hot way yew libîr mar kênî zerrê yew duêrî owk fêk bêri di nûnî rue. Serfiraz pêra kuena astuwar dima, astuwar pernena, astuwar dima vazdana, vazdana astuwar tepêşena, la zaf qefîfena. Ya resena kîye. vûna: ez zaf bîya têşûn, owk çîna ez bişimî.

Howt wayûn ra yew vûna: owk huniya dueri da, dueri ra bişimî. Ya dueri owk bestena xwi qirik; mari zi pa şinu war. Ya vûna. ci mi qiriki ra şî war. Hot wayûn ra yew vûna: cay qîş mirş o.

Demêk binate ra şinu, pîzê ya yi cembenu, masenu.

Biray ya yi vûni: waya ma nêweşa, ma ya yi ber yew hekîm het.

Vêv vûni: nêweş niya; pîc hunu ya yi zerredo, ya yi bikişenî.

Bira i hêna yê piyeser, mişawire kênî. Yi bira i qij ra vûni: bira ti Serfiraz ber lewê yew koya bikiş.

Birawo qij Serfiraz ra vûni: wayê bîye ma şinî yew hekîm het; wa biyuni tu ra. Birawo qij û Serfiraz kuêni tîye şinî. Yi xêliyek waxt şinî, qêflînî, sér yew koya yew yêni owk seri binê nişenî rue. Bira vûni: wayê ma qefiliyayî, ma binê biaris. Serfiraz hesiyena xwi ki, biray ya yi het niyu. Ya zot dûna biray xwi ri; vûna: Bira, bira ti şuêri, dasî mar şuerû tu linga; bîye mi çô meeş ti ra vejû.

Serfiraz wirzena şina, miyûn yew yegayı di raşt yew citiyêr yena. Citiyêr ya yi ra persenu: Ti çiya ci kêsîya, ti ita ci gêrena. Ya ci u, ci nibu her ci citiyêr ra vûna. Rasî yegayı di yew mar qaçibnenû, o hayı di zerrê Serfirazi di mar qaçibnenû. Citiyêr zûnû ki mar hunu zerrê ya yi do. Wi Serfiraz tê benû kê xwi.

Citiyêr ûnû gueş sualin dûnû Serfiraz werdiş. Serfiraz gueş sualin wena, citiyer lingûn ra yayi astarakuna aliqnenu û owk kenû zerrê yew legan, vêr fêk ya yi di erd nûnû rue. Mar gueş sualin werd, biyu têşûn, ayatra wi xwi hêt owka uncenû. İna hêdi, hêdi mar zerrê Serfiraz ra vêciyen kuen zerrê legen. Mudêk cuwapê Serfiraz û citiyer zewicienî. Xêliyek waxt binatera şinû Serfirazi ri di qij bêni.

Ma Serfiraz û citiyer owca di verd. Biray serfiraz waxtigo ya yi owca di verde-nû û het kîyi ya şinû; riyera yew teli şinû yi linga. Yi ço hekîm, ço ziyaret niverdê-nî ti ra gêrenî. Ço nieşkenû dasî mar yi ling ra vejû.

Rojêk Serfiraz wîd qijûn xwi şawena vêr çir. Yin ra vûna: Şima vêr ci ri di kabekay kaybikenî; waxtigo şima kaykêni vajiyeni: ma warzay hot xalûnê, ma qij Serfirazê.

Biray Serfiraz o qij ho gêrenû hekîm, wi tesadufi yenû raşt qijûn Serfiraz yenû. Wi vêng qijûn eşnawenû, şinû qijûn het, vûni: Şima qij kûmî?

Yi vûni: Ma qij Serfirazê.

Wi vûni: şima eşkêni mi bêr kê xwi? Wird laçî Serfiraz yi tê bêni kê xwi. Serfiraz pê dêrzîna dasî mar lingê yi ra veje-na. Lingê ya yi bîna weş. Serfiraz biray xwi ra vûna: Hal hewal ina, inaw. Biray ya yi gêrenû a şinû kê xwi. Birayûn xwi binuri sareamîyi xwi qisêkenû. Yi hot wayûn, yûnî ciniyûn xwi kîşenî.

Hot biray hune ser ey koya têna cuyenî; Serfirazi zi citiyera û di qijûn xwi ya cuyena.

Ingiş

RAMAZAN AYDEMİR

Ceyd bon ceyd nêbon. Yow lacek û ciniyê xu ben. Çend sêr bon zowcî-ye, qic (lîr) yîn çinik. Homay r' zaf dû-hey ken.

Von "Yow qic bid ma, wa hindey yow ingiştî bo."

Homa dûhon yîn qabil kon. Yînîr yow

qic bon hindey yow ingiştow. Ver pey qehrîn dima von "Ma Homay ra ona wayş, Homay zî ona da ma, emr Homay sarî çimon ma ser." Lacek zaf bêkes û çow çin der alîkarî buk. Tim tenya şûn hêga d' xeftiyon ow zaf betifîyon. Epeyî yow deme ona dewam kon, yow rüec cînîye xu ra von "mêyîş (siba) ez laçî z' xu d' ben wa astor bîyar keye, ti bar yey finena, heyna astor tengid wa peyser hêga. Wa wêz yow gûrîfîr bûb. Semêd ina bêkesey ma qic wayşti b'."

Nimac wardon lac xu gen û wûrd pîya şûn hêga. Yow bar vaş wenon astor, lac xu kon zerrey gêş astor erşawon keye. Çend dûrûm ona dewam kon. Yerey

şûn keye weşey lacek ra şûn von "Mi vayn qay qic ma nêşni gure veyn, inkey ha gûre veynon." Zaf pey kêfweş bon.

Epeyî yow wext ona dewom kon. Yow rüec heyne ha gûş astordo rayş yow bazirgon yon. Bazirgo owniyon yow astor ha yena, wêng yow merdim yon labirê çow dima nêason. Şûn nûrdûr astor owniyon ci nêweynon. Biney giyştaron ek veng ha gûş astor ra yon. Owniyon zerrey gûş astor, hindey yow ingişt yow inso ha tidow. Ti ra vecon kon pey gûş xu ra, şûn key xu, cînîyey xu ra von "Mi yow ci diyw hindey yow ingiştow, qal kon, haway insonon o."

In çîw qîşek zaf weşey cînî ra şûn.

nîk kena pîş xu şûna axur monga cir ke-na. Qic keşey yey ra kuwn mîyon eşef. Monga eşef wanna, qic mîyon eşefi d' şûn pîzey monga. Hellak cînîk monga cir kenna, qic zsurrey pîyez monga ra veypdon, von "Hîn bes û tue monga zu-wa key." Gegeyîz çîmon çîço qefilnon nêverdon wa şit bîyor. Cînîk tersena vona "Mongay ma kowta qual." Mîrdey xu ra vona "Ti gerek ina monga sara birn, nû ez tue het nêmonen."

Lacek monga sara birnon, ti ra qic vecon û gen bon cawuk giroti b' heyne veypdon. Qic heyne şûn keye daykê xu û bawk xu het.

Kaddafi: "Ganî kurdî jî wihêrê dewleta xwi bê"



Serekwezîrê Tirkiya Necmettin Erbakan geyrayışê xwi yê Afriqa di, Misirî dima şî Libya û serekê Lîbyay Muammer Kaddafi jî ziyaret kerd. Erbakanî bi ziyaretê xwi ya waşt ki bimojno DYB û Ewropa ki o vera ambargodê ïnan Lîbyay heti di ro.

Na yew qandê Libya û Kaddafi serkewtenê bî. Labelê Kaddafi fina jî Erbakanî rê weş nêkerd û kamerayanê televizyonan û rojnamenuştoxan ver o serekkomarê Tirkiya rê va

Tirkiya kurdan rê zilm kena û ganî heqê kurdan bêro dayeni.

Kaddafi va ganî kurdî jî bi dewleta xwi ya cayê xwi rojdê Rojhelatê Miyanînî bin di bigîrê, heqê ïnan jî esto ki bibê wihêrê dewleta xwi.

Erbakanî jî fina zey ê bînan çiyo verî tekrar kerd û va: "Tirkiya di mesela kurdan çinya, tenya mesela terorî esta."



Şewa PYSK'î

Bi munasebetê virazyayena PYSK'î (Partiya Yewbiyayena Sosyalist a Kurdistanî) 28ê êlule di şaristanê Köln ê Almanya di şewê amê viraştene û na şew di xeylê cayandê Ewropa ra nezdiyê 5 000 kesan beşdar bîy.

Na şew di hem Tirkiya ra û hem jî Ewropa ra xeylê meymanî û hunermendî beşdar bîy.

Ze ki yeno zanayış PYSK, 1ê gulana 1996 di bi yewbiyayena panc grûb, partî û tayn kesan a amêbî viraştene.

Kurdistanê Başûrî roj bi roj vera xirabey şina

Hurdina terefê ki no di serrî û nîm vêşêrî yo vera pê lej kenê halê Kurdistanê Başûrî roj bi roj xirabêrî kenê û ray danê ki dewleta Tirkiya, û Iran û Iraq her roj hewna vêşêrî destê xwi dergkerê kar û barê Kurdistanî miyan û tesîrê ïnan PDK û YNK'î ser o hergi şino vêşêrî bo.


Iran û Iraqî dim a nika jî Tirkiya wazena nê hurdina partîyan dekero tesîrdê xwi bin. Kombiyayena ki na dima Tirkiya di virazyê di tirkmenan ra jî di kesî hadire bî. Tirkiya wazena ki tirkmenî jî ze kurdan idareyanê resmî di bêrê temsîlkerdene. Tirkiya rewna ra behsê mesela tirkmemam kena labelê heta nika kesî goş nedayê ci. Halê kurdan çend xeripyeno hend tirkî jî xwi ïnan ser o ferz kenê.

Mesela Tirkiya a ya ki bi raya tirkmenan hewnê xwi yê Kerkük û Mûsilî rojê bişê bikerê raştey.

Tirkan 28 kurdê Silêmaniye kiştî

Gorey beyanê Partiya Komunist a Îraqî 28 kurdê ki Silêmaniye ra bî mabeynê 7 û 10ê oktobere di hudûdî ser o kişa eskerandê tikan a ameyê tepiştene û dima ameyê kiştene. Nê kesî sivîl biyê û waştê ki bi raya Tirkiya şirê Ewropa. Gorey beyanî cenazeyê nê kesan 23yê oktobire di ameyê Silêmaniye. Tirkiya nê kesî ze ki PKK ra bê ilan kerdi.

Nameyê kê yenê zanayeni nêyê: 1-Rêgan Osman Heme Salih 2-Serbest Osman Heme Salih 3-Barzan Ekrem 4-Hawşîn Ekrem 5-Azad Mistefa 6-Herak Ebdula Umer 7-Germiyan Heme Salih 8-Muhemed Ahmed 9-Rizgar Elî 10-Kuslan Zorab 11-Namiq ... 12-Tahir ... 13-Bextiyar ... 14-Feryad heme 15-Azad ... 16-Mistefa ... 17-Macid ... 18-Emîn ... 19-Azad ... 20-Mistefa Xanaqî 21-Mistefa ... 22-Kaka Husêن (Hewlêr) 23-Newroz...



Leyla Kaplan



Guler Otac

Adana û Sêwas di intixarı

Roja 27ê oktobire di keynekênda kurd bi namedê Leyla Kaplan, Adana di merkezê polîsan ver o bombaya ki xwi ya girêda bî teqnê bi xwi, hîrê polîsê tirkan û kesêndo sivil merdî û 11 kesî jî ki ïnan ra 8 kesî polîsî bî birîndar (dirbetin) bîy. Leyla Kaplan 17 serrê bî û malba-ta ci Kızıltepe ra ya û nika Adana di bi ca biya.

Fina roja 29ê meng di, Sêwas di jî keynekênda kurd ki nameyê ci Güler Otaş (Bermal) bi, bombaya ki xwi ser o girêdabî xwi ser o teqnê, 3 polîsî, kesêndo sivil û a bi xwi merdî. Güler Otaş 19 serrê û Batman ra bî.

Verê Leyla û Güler, Zeynep Kinaci 30ê hezîrane di Dêrsim di xwi ser o bomba teqnê bî, a bi xwi û 6 eskerî merdî bî.